


DR. QASIMLO RÊBEREKE BÊ NIMÛNE



Baskirin, gotin, nivisîn, lêkolînkinin û hwd... li ser jiyan û kesayetiya rêberê zana û jêhatî yê neteweya Kurd Dr. Ebdulrehman Qasimlo, hindî bihê kirin, hêsta kêm e. Ji ber ku jiyana wî rêberê leheng û gernas tejî ye ji xizmet bi gel, buha û nirxên mirovahiyê.

Bi hinceta 16'mîn salvegera şehîdkirina wî rêberê mezin di sala 13.07.1989'ân bi destê terorîstên Komara İslamî ya Îranê ve, rîzdar Hesen Şerefi, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di rî û resma bibîranîna wî di binkeya Deftera Siyasi bi hûrî û berfirehî li ser gelek aliyen jiyan û kesayetiya Dr. Qasimloyê nemir axivî ku di vê hejmara Agîrî de (21) ketiye ber çavê we hêjayan.

Bibîranîna 16'mîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî di binkeya Deftera Siyasi ya PDK Îranê de



Pêşnîvroya roja çarşemî 22'ê Pûşpera 1384'ê Rojî (13.07.2005) rî û resmeke taybet bi hinceta 16'mîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo, rêberê jêhatî û leheng yê tevgera neteweyî - demokratik yê Kurd li Kurdistana Îranê û Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û Kekê Ebdula Qadîrî Azer, Nûnerê Partiyê li derveyî welat û Dr. Fazil Resûl di binkeya Deftera Siyasi ya PDK Îranê bi beşdariya Sekreterê Giştî yê Partiyê û endamên Deftera Siyasi û Komîteya Navendî û Kadro û Pêşmergan hate li darxistin.

Rê û resm bi sirûda neteweyî ya **Ey Reqîb** û deqîqeyek bêdengî bo rîzgirtin ji canê paqîj yê şehîdan dest pê bû. Piştre hevalê xebatkar Kekê Hesen Şerefi, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê axavtineke girîng û balkêş li ser aliyen cuda cuda yên jiyan û kesayetiya Dr. Qasimlo û nemaze rojeva siyasi ya 16'mîn salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo pêşkêş kir ku di rûpela 7 - 9 ya vê hejmara Agîrî (21) ketiye ber şavê we xwendevanê hêja. Di rî û resmê de gelek berhemênerî hatin pêşkêş kirin.

Konferanseke Ragihandin û
Çapemeniyê bi hinceta 16'mîn
salvegera Dr. Qasimlo

5

Demokrasi, buha û piratîka wê

(Beşa 13)
Kurmanc Hakkî

10

Destê xwe yê querêj ji ser gelê
me li Rojhilate Kurdistanê
rakin Cankurd

11

Rojeva siyasi ya Îranê pişti hilbijartînê

Selîm Zencîrî

13

Ragihandina Nûjen û çend gotinek

Emîr Şuaîvend


19

Xwenîşandana berfireh ya xelkê azadîxwaze Mehabadê di salvegera terora Dr. Qasimlo de

Pişti vê ku di roja çarşemî, 22'ê Pûşpera 1384 (13.07.2005)'an, xelkê azadîxwaz û şoreşvan yê Mehabadê bi hinceta 16'mîn salvegera terora nemirovane ya şehîd Dr. Qaimlo û hevalên wî li ser maseya gotûbêjê bi destê terorîstên Komara İslamî, dest bi daxistin û girêdana hemû dikan û bazaran kirin û xwenîşandanî lidarxistî, tevî êrişen hov û tund û tûj yên hêzên Komara İslamî rû bi rû bûn. Gelek kes hatine girtin û işkence kirin.

Di encama xwenîşandanê de teqe ji xelkê hate kirin û ciwanek bi navê **Kemal Esferam**, naskirî bi **Şiwane Qadîrî** hate birîndar kirin û piştre bi awayekî gelek hov û nemirovane cendekî wî yê birîndar hatîbû işkence kirin û şehîd bû. Pişti şehîdkirina wî ciwanê Mehabadî heta 10 rojan meşenî nerazîbûnê li Mehabadê dom kirin û çend bajarêñ din yên Kurdistanê jî kiryarêñ hêzên rejîmê li Mehabadê şermezâr û protesto kirin.

Nûçe, rapor û daxuyaniyê PDK Îranê derheq vê cinayetê di vê hejmara **Agîrî** de bixwînin.



Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDK Îranê derheq serkûtkirina xwenîşandanêن Mehabadê

Roja 22'ê Pûşpera 1384'ê Rojî, hemberî 13.07.2005'an, bi boneya 16'mîn salvegera terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û hevalên wî li Viyenê, Serbajarê welatê Otrişê bi destê teroristên Komara İslâmî ya Îranê, careke din xelkê Kurdistanê bi awayen cur bi cur ew kiryara hov û nemirovane ya rejîmê mehkûm kir û bêzariya xwe ji wê rejîmê dan xuya kirin.

Xelkê netirs û biwîr yê Mehabadê û nemaze ciwanêن wî bajarî di roja 18'ê Pûşperê (09.07.2005), komek xwenîşandan di cihêن cuda cuda yên bajêr birê xistin ku tê de hezaran kes ji demijmîr 7'ê şevê hetanî 12'ê şevê bi alîgirî ji Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û bi merema mehkûm û şermezarkirina Komara İslâmî dirûşm avêtin û bi kevir û daran êrîş kirin ser hêzên serkûtker yên rejîmê.

Roja 22'ê Pûşperê, tevahiya dikanêن bajar hatin daxistin û rejîmê jî hezaran kes ji hêzên xwe yên qirker di derdora bajêr û cihêن cuda cuda yên bajar de bici kirin.


Mixabin heta niha yek ji wan kesêن çeleng di lidarxistina xwenîşandan, naskirî bi Kemal Esferam, kurê Qadir naskirî bi **Sivane** ser êvariya roja 18'ê Pûşperê (09.07.2005) kete ber êrîşa hêzên rejîmê û bi tundî hate birîndar kirin û di cihê gehandina wî ji bo nexweşaneyê, bo "Emakin" (Saziyek e ku dijî azadiyêن civakî hatiye ava kirin) hate birin û bi sedema îşkenceyêن hovane yên hêzên dijî gelî bi awayekî hov û dirindane jiyana wî hate standin û hejmareke zaf ji besdarêن wan Koma xwenîşandan jî hatine girtin û ber bi girtîgehêن reş û tarî yên rejîmê hatine rapêçkirin.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana
Îranê
Deftera Siyasî¹
22'ê Pûşpera 1384'ê Rojî²
13.07.2005**

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê derheq îşkencekirian girtiyêن meşa nerazîbûna vê dawiyê ya bajarê Mehabadê

**Hevwelatiyêن birêz!
Civatêن xebatkar yê elkê Kurdistanê!
Kom û komeleyêن mirovhez!
Alîgirêن mafêن mirovan!**

Di encama meşa nerazîbûna xelkê bajarê Mehabadê piştî kuştina ciwanekê Mehabadî bi navê Kemal Esferam naskirî bi **Şiwane Seyîd Qadîrî** bi destê hêzên dijî gelî yên rejîmê di 18'ê Pûşperê û bi bobeya 22'ê Pûşperê, 16'mîn salvegera terora Dr. Qasimlo, ku nêzîk deh rojan dom kir, pitir ji 200 kes ji xelkê vî bajarî ji aliye hêzên serkutkar û dezgehêن Îtilaat (Sîxor û Casûsi) a rejîma Komara İslâmî ve hatin girtin û rapêçî girtîgehê kirin. Ev hejmare ji xelkê bajarê Mehabadê çend roj e ku gelek bi tundî û bêrehmañe ketine bin îşkenceya ruhî û cendekî û sivikatiyeke zaf ji wan hatiye kirin û tevî çarenivîs û qedereke nexuya rû bi rû hatine kirin. Di wê derheqê de Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê tevî mehkûm û şermezarkirina vê riftara dijî gelî ya rejîmê, daxwazê ji kom û komeleyêen mirovhez û alîgirêen mafêen mirovan, li seranseri cihanê û rêxistinêni siyasi yên Îranî û Kurdistanî dike ku li hember can û qedera wan xortêñ azadîxwaz yên, bendkirî helweta hewce bigirin û rejîma Komara İslâmî bixin bin zext û givaşê ji bona azadkirina wê hejmarê ji xelkê bajarê Mehabadê.



Her wiha daxwazê ji xelkê Kurdistanê dike ku nerazîbûna xwe li hember riftarêñ dijî gelî yên rejîmê derheq girtiyêن bajarê Mehabadê bi awayê jêhatî bidin xuya kirin û rejîmê bixin bin givaşê ku dest ji îşkence kirian berde û ji bo azadiya wan girtî û bendkirian gavan bavêjin.

Diyare ji bilî wan binçavkirî û girtiyan, pitir ji 200 kes ji xelkê bajarê Mehabadê û hejmarek ji ciwanan ji bajarêñ Bokan, Merîwan û Pîranşarê jî hatine girtin ku ew jî her hatine îşkence û azar dan.

Bi vê hêviyê ku helweta hewce û jêhatî ya hemû aliyeke bibe sedema serbestberbûna girtiyan û rê ji Komara İslâmî nehete dayîn ku bi vî awayê berfireh, bêrehm û hovane xortêñ gelê Kurd li Kurdistan Îranê bixe bin îşkenceyê û wan bi qedereke nediyar re rû bi rû bike.

Bi hêviya hewl û xebata tev aliyeke

**Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana
Îranê
1384.05.03
24.07.2005**

Nameya birêz Kekê Mistefa Hicrî ji bo Serkomarê Otrişê bi hinceta 16'mîn salvegera terora rêberê me yê mezin Dr. Qasimlo û daxwaza dadgehîkirina bikujên wî rêberê hizirvan

Zor birêz Dr. Hayînts Fîşêr!
Serok Komarê Otrişê!

Ji çend heftiyan berî niha ve, gelek rojnameyên Îranî û biyanî, nûçeyê desthebûna rasterast a Mehmûd Ehmedînejad, Serok Komarê nû hilbijartî yê Îranê di terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û hevalên wî, di 13.07.2005'an de li Viyenê, diweşînin.

Hûn yê rêzdar wekî dostê naskirî yê gelê Kurd û cihê bawerî, hitbar û rêza taybetî ya Dr. Qasimlo û hevalên wî di Parta Demokrat a Kurdistana Îranê de, haydarê çawaniya bûyerê ne. Dewleta wê demê ya Otrişê, bi heyrîmayînekî tewaw ve serbarê eşkerebûna berpirsiyariya Komara İslâmî di vê cinayetê de, rê ji ber pêkhatîna dadgehê ji bo wan terorîstan girt ku ketibûne destê Polîs û hêsanî karî ji bo wan kir ku bikuj bi hêsanî bikarin ji rêya balyozxaneya Îranê ve vegerine Tehranê.

Ger Komara İslâmî karî bi terora rêberê jêhatî yê me Dr. Qasimlo, derbekî mezin ji Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û tevgera rizgarîwaz ya gelê Kurd bide, ji aliye din ve jî dewleta wê demê ya Otrişê ji bi pêşgirtin ji rohnbûna wê terora siyasi, zulmeke mezin

Peyama birêz Sekreterê Giştî yê Partiyê ji bo birêz Tonî Bilêr bi hinceta teqînên dilêş yê Londonê

Serok Wezîrê birêz Tonî Bilêr!

Mixabin! Min nûçeya dilêş ya teqînên roja 7'ê Julaya Londonê bihîst ku tê de hejmarek ji Jin û Mêrên sivil hatin kuştin û birîndar kîrin. Min pê xweşe we haydar bikim ku rêberiya partiya me bi awayekî giştî vê kiryara terorîstî mehkûm dike. Di vê derheqê de em hevxemî û kesera xwe pêşkêşî malbatêن goriyan û hemû xelkê Londonê dîkin. Em xwe bi hevxemî we dizanîn û hêvîdarin ku hikûmeta we, berpirsiyaren wê bûyerê radestî dadgehê biket.

Em xwe di vê xemê de pişikdar dizanîn û destê dostînî û hevaletiyê ji bo aliye we dirêj dîkin û di xebata dijî Fendemîntalîzm û terorîzma navneteweyî de em piştgiriyê ji we dîkin.

Mistefa Hicrî

Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
9'ê Julaya 2005'an

derheq gelê Kurd bi rewa zanî. Lewre mirovê Kurd niha jî derheq helwesta Otrişê bi heyrîmayînekî tewaw ve ji xwe dipirse: Otriş çîma?

Bi hinceta nêzîkbûn ji 16'mîn salvegera terora 13'ê Juiyeyê, em daxwaza sertaze vekolîn û dadgehî kirina berpirsiyaren terora rêberê xwe yê mezin dîkin.

Niha hûn Serok Komarê Otrişê ne û cihê rêz û hurmeta hemû aliyeke ne, em çavnihêrê vê çendê ne ku hûn bi navê edalet, mafê mirovan, azadî û demokrasiyê ve, wate hemû ew armancênu Dr. Qasimlo di hundirê xwe de bawerî pê hebû û canê xwe jî di vê rîyê de gorî kir, piştgiriyê ji vê daxwaza rewa û berheq ya me bikin. Eva jî ne tenê ji bo qerebûkirina parek ji vê stema mezin ku bi terora Qasimlo ji neteweya Kurd hate kirin, ji ber wê ku gelê Kurd û hemû gelên din yê cihanê jî bizanîn ku Otriş di bin rêberiya we de, wek welateke demokrat bawerî bi edaletê, mafê mirovan û serxwebûna dezgeha dadê heye.

**Di gel rêz û hurmetan de
Mistefa Hicrî**
**Sekreterî Giştî yê Partiya
Demokrat ya Kurdistana Îranê**
07.07.2005

Di Finlandê de 16'mîn salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo bi meşekê hat bibîranîn

Li Finlandê rûniştvanenê Kurd yê wî welatî, roja çarşemî 13'ê Julaya 2005'an li bajarê Helsînkî bi xwedî derketin ji salvegera şehîdbûna Dr. Qasimlo û hevalên wî bi awayekî girseyî xwepêşandanek li darxistin.

Xwenîşandana han ji aliye hemû hêzên siyasî yê Kurd ku



pêkhatibûn ji PDK Îranê, Komeleya Zehmetkêşen Şoreşger ya Kurdistanê Îranê, Partiya Komonist ya Kurdistanê, Partiya Yekîtiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê, Kongra Gel û hinek hêzên di yêni siyasî dihat meşandin.

Di destpêka xwepêşandanê de deqîqeyek bêdengî bo rêzgirtin ji şehîdên bûyera Viyenê û hemû şehîdên Kurdistanê ragirtin, piştre ji aliye birêz Mecîd Heqî berpirsiyare peywendiyen PDK Îranê li Finlandê ve gotara hevpişk ya hêzên pişikdar yêni xwepêşandanê hat pêşkêş kîrin. Di Xwepêşandanê de gelek belavokên li ser bûyera Viyenê bi zimanen Finlandî û Kurdi hatin belavkirin. Piştî gîhiştina xwepêşanderan bi balyozxaneya Otrişê, birêz Mecîd Heqî bi nûneratiya xwepêşanderan hevdîtinek tevî balyozê wî welatî pêk anî û rapor û armanca xwepêşandanê raberî balyozê Otrişê kir û hêvî xwast ku dosyeya Dr. Qasimlo carek din bihê vekirin. Xwepêşandan di seet 2:30'ê piştînîro bi dawî hat. Hêjayî gotinê ye ku xwepêşandanen bi vî rengî bi awayen hêja û berfireh li welatên weke Amerika, Otrişê, Usturaliya û Norwejê hatin li darxistin.

Daxuyaniya Çapemeniyê ya Sekretariya Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê derheq serhildana gelî ya azadîxwazên bajarê Şino'yê

Demijmîr 8:30'ê pêşnîvroya îro duşemî, 3'ê Gelawêja 1384'î Rojî (4.07.2005), xelkê qehremane bajarê Şino'yê bi nîşana nerazîbûna dijî girtin û binçavkirina pitir ji 200 kesan li bajarêne Mehabad, Pîranşar û Merîwanê û ji bo mehkûm û şermezarkirina riftara hêzên rejîmê di pêwendî tevî işkencekirina girtiyan û zîndanîkîriyên Mehabadê û bi talan birina tiştên nav mal û dikanê xelkê, dikan û bazarêne bajar daxistin û meşeke nerazîbûnê ya aram li darxistin. Bi dirûşmîn dijî rejîmê vêzariya xwe ji Komara İslâmî ya Îranê dan xuya kirin û bi dana dirûşmîn azadîxwazane piştevaniya xwe ji tevgera rizgarîxwaz ya gelê Kurd li



Şehîd Bayezid Mérûfi

Kurdistan Îranê û Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê xuya kirin.

Hêzên rejîmê teqe ji xelkê kirin û 2 kes ji xwenîşanderan bi navê: **Heyder Ebdulazade** û **Omer Eminî** kurê Şêx Mihemed, Şehîd û hejmareke din jî birîndar kirine. Hêzeke zaf ji bajarêne Miyanduav û Urmiyê ber bi bajarê Şino'yê hatiye şandin. Xelkê vêzarbûyî yê bajarê Şino'yê di rewşike gelek xirab û nebaş de ye û ketine ber êrîşa hovane ya hêzên serkutkar yên Komara İslâmî.

Sekretariya Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê
1384.05.03
24.07.2005

Xwenîşandana berfireh û qehremanane ya xelkê Mehabadê di salvegera terora Dr. Qasimlo de

Roja çarşemî, 22'ê Pûşpera 1384 (13.07.2005)'an, xelkê azadîxwaz û şoreşvan yê Mehabadê bi hinceta 16'mîn salvegera terora nemirovane ya şehîd Dr. Ebdulrehman Qaimlo û hevalêni wî li ser maseya gotûbêjê ji aliyê diplomatên terorîstperwer yên Komara İslâmî, serbarê daxistin û girêdana hemû dikan û bazaran, demijmîr 11'ê sibê di helwesteke şoreşvanî û siyasiyane de rîjiyane ser şeqam û rîyan ku bû sebesê pevcûn di navbera ciwanan û Garda (hêza) dijî şoreşê û ev hêzane di bin êrîşa dar û beran ya ciwanan de neçar man paşde bikişin.

Her di êvariya wê rojê de, pitir ji 5 hezar kes ji rêvîngêñ rê û rîbaza Dr. Qasimlo dubare rîjiyane ser şeqamên "Îstiqlal", "Baxî Şayegan" û "Pişt Tepe" ya Mehabadê û bi vegotina dirûşmîn: **Qasimlo, Qasimlo, rîya te dirêjî heye, Dayê negirî bo xortan, şert be em bistînin tolê, Meha Pûşperê, roja terora Rêber, Meha Pûşperê sedema**

meşxela rizgariyê ye, Rêberê neteweya Kurd her Partiya Demokrat e, Neman bo Caş û xwefiroşan, Bijî hêza Pêşmerge, Para dijmin mirin e û Demokrat serwer e, Qasimlo Rêber e, koşka rejîma dijî gelî û kevneperek ya Komara İslâmî ya Îranê anîne lerîzinê.

Hêzên serkûtker yên rejîmê li hember xwenîşandana berfireh ya gel de rihet nesekinîn û bi teqandina gulan û belavkirina Gaza hêşir rijandinê êrîş kirin ser xwenîşandana gel. Lê ciwanên netirs û xebatkar yên Mehabadê êrîş kirin ser hêzên rejîmê û agir berdane otombêleke Peykan û Matoreke hêzên İtilaat (hêza sîxor û ajan). Hêzên newêr yên rejîmê nekarîn li hember êrîşa xorten gelê Kurd li Mehabadê bisekinin, lewra wan dest bi şikandina şûse û pencereyên malên xelkê medenî û sivîl kirin.

Hêjâyî gotinê ye ku ew xwenîşandan hetanî demijmîr 2'ê şevê dom kir.

Kuştin û birîndarkirina çend welatiyên Kurd di xwenîşandanen bajarêne Bane, Sine û Dîwandere de

Şeva 7'ê Gelawêja 1384'ê Rojî (29.07.2005) hêzên hov yên rejîma Komara İslâmî li Dola Nicnê ya bajarê Bane çend kasibkarên wê herêmê dane ber guleyan û kesek bi navê **Hekîm** kuştin û kesekek din jî bi navê **Luqman Nesrulayî** kurê Esyîd Ebdula xelkê Bane hate birîndar kirin. Welatiyên Kurd xwastin ku kesê birîndar bibin nexweşxaneyê, lê hêzên rejîmê nehêlan û guleya xilas û mirinê ji wî dan û jiyana xwe ji dest da.

Li bajarê Bane niha Rewşa Awarte hatiye ilan kirin. Hêzên leşkerî yên rejîmê di nav bajar de digerin. Lê niha jî meşen nerazînbûnê her berdewam in.

Roja 8'ê Gelawêja 1384'ê Rojî (30.07.2005), li bajarêne Sine, Bane û Dîwandere bo piştevanîkirin ji meşen nerazîbûnê yên vê dawiyê li Mehabad, Serdeş, Pîranşar û Şinoyê rîjiyane ser rî û şeqaman û dirûşmîn dijî rejîmê û piştevanî ji tevgera gelê Kurd avêtin.

Rewşa bajarêne Kurdistana Îranê aloz e û ji aliyê hêzên rejîmê ve bi tundî hatine milîtarîze kirin.

16'mîn salvegera terora Dr. Qasimlo û hevalên wî di Konferanseke Ragihandin û Çapemeniyê tevî rîzdar Hesen Şerefi, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê


Amadekar: Azad Kurdî

Bi hinceta 16'mîn salvegera terora rîberê zana û mezin yê gelê Kurd Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û hevalên wî li Viyena Otrişê, Konferanseke Çapemenî û Ragihandinê ji bo rîzdar Hesen Şerefi, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê derheq pêtir balkışandin bi ser aliyêن cuda cuda yên vê cinayeta teroristane ya Komara İslâmî ya Îranê û rola Serok Komarê nû hilbijartî yê vê rejîmê, Mehmûd Ehmedînejad û pirsên têkildar yên xebata berheq û azadîxwazane ya gelê Kurd li Kurdistana Îranê pêk hat.

Nûçegihanê hejmarek ji Ragihandinê giştî wekî: **Para Kurdî ya Dengê Amerîka, Zagros TV, IPTV, Ajansa**

Royterz, Televîzyona El- Cezîre, Radyo Dengê Azadî, Ajansa Nûçeyan ya Peyamnîr, Radyo Dengê Kurdistana Îranê, Ajansa Frans Pirês, Heftînameya Cemawer, "Hawler Globe", Rojnameya Kurdistan Organa Komîteya Navendî ya PDK Îranê, Agirî û Enistîtuya Rojnamevaniyê ya "Ceng û Aştiyê" besdari Konferansa han bûn.

Di destpêka Konferansê de rîzdar Hesen Şerefi, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bi hûrî û berfirehî li ser dem û çawaniya terora Dr. Qasimlo û hevalên wî sekînî û got: "serbarê wê çendê ku Dewleta wê demê ya Otrişê pêşîya rewta lêkolînan ji bo wê dosyeyê girt û encama lêkolînkin li ser vê terorê bigihîje dawiyê, lê em dibînin piştî 16 salan di wan çend rojê çûyî de û bi taybet paş birêveçûna gera nehem ya hilbijartina Serok komariyê di Îranê de, doza terora Dr. Qasimlo careke din yê ketiye rojeva Ragehandinê Giştî, bas li ser de tê kirin û ji mîzgehîn cur bi cur ve li ser de tê gotin. Eva jî bo vê çendê



vedigere, ew kesê ku bi piştevaniya dezgeha hikûmetê serî ji Sindoqên dengdanê derxistiye, bi wê çendê gunehbar e ku di terora Dr. Qasimlo û hevalên wî de dest hebûye.

Piştire nûçegihanê Para Kurdî ya Dengê Emerîka, Omer Ferhadî pirs kir:

Nûçe wiha didin xuya kirin ku Serok Komarê nû hilbijartî Ehmedînejad di terora Dr. Qasimlo û hevalên wî de dest hebûye. We wekî PDK Îranê ci belge û dokumentek heye di vî warî de ku pêşkêsi dewleta Otrişê bikin?

Di bersivê de, birêz Hesen Şerefi got: "Her di destpêka terora Dr. Qasimlo de me ji bilî Komara İslâmî tu keseke din gunehbar nezanî. Pêvajoya bûyerê jî hemû bo wê çendê şahidiyê didin ku ji bilî Komara İslâmî tu kesê di wê teror û cinayeta hovane de dest nebûye.

Ewê ku di jorê de bûn, şandiyê Komara İslâmî bûn. Her 3 hevalên me şehîd bûn, lê ew bi

silamet xilas bûn, yek ji wan nebe ku gelaleyek bi şâşî lê ketibû, li serê her 3 şehîdên me guleyên xilas û dawiyê hatibûn dayîn, li halekê de ew birîndar (Cefer Sehrarûdi) û du kesên din Mistefa Ecwadî naskirî bi Hacî Mistefewî tevî Emîr Mensûr Buzorgian, Ewê ku di wî avahî de derketibûn, 15 deqîqeyan piştî bûyerê ew du hatin girtin û kesê ji bo nexwşxaneyê hatibû veguhastin, lê dewleta Otrişê ne tenê ew wekî gunehbar ji bo lêpirsînê, heta wekî şahidên zîndî yên bûyerê jî li Otrişê neragirtin û ji bo Îranê şandin. Ku wisan e di bingeh de ew teror bi destê Komara İslâmî hatibû kirin".

Her di vê derheqê de, hevalê hêja û xebatkar, kekê Hesen Şerefi qala wan agahî û zaniyariyan kir ku şahîdê D ji

yen ji terorîstan bi navê Nasir Teqîpûr wergirtine û şahîdê D taze ji Îranê hilatiye û li Parîsê dijît.

Nûçegihanê Ajansa Peyamnîr pirs kir: **EV guhertine di helwesta Otrişê de bo ci vedigere?**

Rîzdar Hesen Şerefi bi vî awayî bersiv da: "Heta niha jî be em ci guhertinek di helwesta dewleta Otrişê derhq pirsa terora Dr. Qasimlo de nabînin. Eva ku niha heye, zext û givaşa raya giştî û givaşa Pîtr Pîltz, yek ji Perlemantarê Otrişê ji Partiya Keskan e".

Di doma wê Konferansê de, nûçegihanê Radyo Dengê Kurdistana Îranê Mehdî Mêhrperwer pirs kir, **ew sedem ci ne yên ku rê nadîn lêkolînên dosyeyê Dr. Qasimlo û hevalên wî bigihîje encamê?**

Kekê Hesen Şerefi ev pirsa wiha bersivand: Ew sedemên ku bûne sebebê vê çendê ku dewleta Otrişê pêşîya lêkolînên dosyeyê bigre û Komara İslâmî wekî gunehbarê eslî û serokên wê rejîmê wek kesên ku destûr û fermana terorê dane bide nasandin, bo çend tiştan vedigere: Yekem: Peywendiyeye ➔

alwêr û ticaretê ya berfireh ku Otrişê tevî Komara İslâmî heye û bi taybetî di çaxê terora Dr. Qasimlo û piştî wê jî ew peywendiyêن bazirganî û ticarî gelek berfirehtir bûn, bi awayekê ku Wezîrê Karê Derve yê wê demê yê Otrişê gelek bi serbilindî ve da xuya kirin ku me karî ye ew hisara ku Amerîka li ser Komara İslâmî daniye bisikînin. Sedema din jî ewa bû ku Dewleta Otrişê, xala lawaz li ber destê Îranê û Îraqê de hebû. Di çaxê şerê Îran û Îraqê de, tevî wê çendê ku li gor qanûnê dewleta Otrişê nedikarî çek û teqemeniyê bi her du 2 welatên ku di halê şer de bûn, bifroşe, dewleta wê demê ya Otrişê bi her du dewletên han çek û teqemenî firotibûn. Selimandina vê itihamê ku dewleta Otrişê kareke wiha kiriye, bê gotin û merc dê biba sebebê dest ji kar kişandina dewletê.

Li dor pirsa nûçegihanê Televîzyona Erebî ya **El-Cezîreyê** de, derheq hatina Amerîka bo Îraqê û ev guhertinê mezin ku pêk hatine, eva ci bandorekê li ser doza Kurd li Îranê dike?

Kekê Hesen Şerefî got: "Hatina Amerîka di bin her navekê de bibe, encameke baş ji bo Kurdan jê ketiye û her rewsek baş jî ku ji bo gelê Kurd di her pareke Kurdistanê de bihete holê, bandoreke rasterast û nerasterast li ser qedera Kurd di parçeyên din yên Kurdistanê dejî heye. Em naveşîrin ku Kurdistan axek e û hatiye parve kirin, Kurd neteweyek e û ji hev hatiye dûr xistin û heke rojekê ew xelke bixwazin bi hev re bijîn û xwediyê dewleteke Kurdî bibin, ewa mafê wan e. Ev mafênu ku niha gelê Kurd li Kurdistana Îraqê hene, ji bo me cihê keyfxweşiyê ye û di demeke dûr yan nêzîk de dê bandorê li ser rewşa me jî bike".

Di doma Konferansê de gelek pirs derheq rojeva siyasi ya Îranê û helwest û awayê xebat û tekoşîna PDK Îranê li Kurdistanê hatine rojevê.

Rêzdar Hesen Şerefî, bi Hûrî û berfirehî pirsên nûçegihanen bersivandin.

Hêjayî gotinê ye ku Konferans di yek ji binkeyên Deftera Siyasi ya PDK Îranê de hate lidarxistin.

Nameya hevalê xebatkar Kekê Mistefa Hicrî ji bo birêz Wêlfang Şowîsêl bi merema darizandina bikujên rêberê me yê mezin Dr. Qasimlo

Zor birêz Dr. Wêlfang Şowîsêl!

Sedr Ezemê Otrişê

Li gor hin zaniyariyan ku di çend heftiyêñ borî de hatin belavkirin, Mehmûd Ehmedînejad ku di roja 24.06.2005'an de li şanoyekî hilbijartînê wekî Serok Komarê Îranê hate destnîşan kirin, rasterast di amadekarî û birêvebirina terora 13'ê Juiyeya 1989'an li Viyenê pişikdar bûye.

Wekî hûn dizanin di vê terora siyasi de, Sekreterê Giştî yê Partiya me yê wî çaxî, Dr. Ebdulrehman Qasimlo, ji aliyê dewleta Refsencanî ku bi nav ji bo peydakirina râcereyekê ji bo doza Kurd di Îranê de bo welatê Otrişê hatibû vexwandin, tevî du hevalên xwe bi navên Ebdula Qadirî Azer û Dr. Fazil Resûl, bi nûnerên şandî yên Komara İslâmî li ser maseya gotûbêjê hatin teror kirin.

Herçiqas di yekemîn demên vê bûyerê de ji bo hemû kesê û bi taybetî ji Polisê Otrişê re eşkere bû ku ew tirajêdiya han bi fermana rêberên Komara İslâmî hate afirandin, lê mixabin dewleta wî çaxî ya Otrişê li ber çavê raya giştî ya cîhanê, zagona serxwebûna hêza dadweriyê xiste bin pêyê xwe û bi vî rengî rê ji ber pêkhatina daggehê û bi siza gihadina bikujên wê bûyerê asteng kir.

Rêzdar!

Wî çaxî ji ber hin berjewendiyêñ aborî û siyasi rê li hember çespandina mafêni mirovan hate asteng kirin. İro ev derfete ji bo we peyda bûye ku vê bê edaletiyê rast bikin û ev zulma giran ku derheq gelê Kurd û bizava azadîxwazî ya Îranê hatiye kirin, heya qasekê bihê kirin.

Ez bi navê Partiya Qasimlo û gelê Kurd, ji we yê birêz dixwazim, rê nedin carekî din tu berjewendî û têbîniyêñ siyasi rê li hember çespandina edaletê asteng bikin. Berevajî em li benda vê çendê ne ku hûn ji vekirina dosyeya terora Dr. Qasimlo û perdehilanîn li ser terajêdiya hovane ya 13'ê Juiyeyê, pişta me bigrin.

Tevî rêt û hurmetan

Mistefa Hicrî
Sekreterê Giştî yê PDK Îranê

Navenda 3'ê ya Kurdistanê 16'mîn salvegera sehîdkirina Dr. Qasimlo bibîranî

Bi boneya 16'mîn salvegera terora şehîd Dr. Qasimlo û hevalên wî ji aliyê rejîma terorîstperwer a Komara İslâmî ya Îranê ve, li Navenda 3'ê ya Kurdistanê bi pişkdarîya sandeke payebilind a Partiya Sosyalist ya Kurdistana Turkiyê, Lîjneya Devera Beranetî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îraqê û Kadro û Pêşmergêñ Partiya me rê û resmekte hêja hate lidarxistin.

Destpêka rê û resmî bi xwendina sirûda neteweyî ya **Ey Reqîb** û ragehandina degeyek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqîj yê şehîdîn Kurdistanê dest pê kir.

Piştî wê peyama navenda 3'ê ya Kurdistanê, ji aliyê birêz Mihemed Salih Qadirî, endamê Komîteya Navendî û Berpirsê Navendê ve hate pêşkêş kirin. Di peyama birêz Qadirî de işare bi bûyera Viyenê û bizava rizgarîxwaz ya gelê Kurd û PDK Îranê û çend aliyên din hatibû kirin. Piştî peyama Partiya Sosyalist ya Kurdistana Turkiyê ji aliyê rêzdar Kovan Amedî ve hate pêşkêş kirin ku tê de li ser girîngiye rola Dr. Qasimlo di tevgera gelê Kurdistanê de û... tekez hatibû kirin.

Piştî peyama Lîjneya Devera Beranetî ya Partiya Demokrat ya Kurdistana Îraqê ku ji aliyê rêzdar Teyib Zerar Ebdulrehman ve hatibû nivîsin, hate pêşkêş kirin û tê de bîranîna Dr. Qasimlo wekî rêberê tevgera mafîxwaz yê gelê Kurd li Kurdistana Îranê û kesayetiya diplomatîk û xebatkar ya wî şehîdî mezin bilind hatibû nirxandin. Herwiha di doma vê rê û resmî de Peyamîn Yekîtiyê Jinan û Ciwanîn Demokrat yên Kurdistana Îranê hatine xwendin.

Dawiya rê û resmî bi hîlkirina 16 moman bo rêzgirtin ji bîranîna şehîdî nemir Dr. Qasimlo û hevalên wî û xwendina sirûden şoreshvanî, pexşan û nimayış kirina şanoyê bû ku ji aliyê beşdaran ve bi germî hate pêşwazî kirin.

Deqa Axavtina hevalê hêja û xebatkar Kekê Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di rê û resma 16'mîn salvgera terora Dr. Qasimlo de



**Hevalên xweştevi!
Xûşk û birayên hêja**

Îro 22'ê Pûşpera 1384'ê Rojî hemberî 13.07.2005'an, 16 sal bi ser bûyera tal û dilnexweş ya 22'ê Pûşperê, terora kesayetiyê mezin û navdar yê Kurd, rêberê jêhatî yê PDK Îranê Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Kekê Ebdula Qadirî Azer, endamê komîteya Navnedî û Nûnerê Partiyê li derveyî welat û birayê me yê Kurdê Îraqê Dr. Fazil Resûl re derbas dibe. Ji wê demê heyâ niha em hemû salekê di vê rojê de li devra hev kom dibin, bona vê çendê ku em xem û kula giran ya wê bûyera tal ku li ser dilê me ye, bidin xuya kirin, ew bêzari û nefreta ku me ji terorîzma Komara İslamî heye bidin xuya kirin. Di wan çend salêñ derbasbûyi de jî em hertim di vê boneyê de rêtê ji bîranîna şehîd û hevçepereke din yê xwe digirin ku di 24'ê Pûşpera sala 1378 (1999)'an de jiyana xwe ji dest da û domandina rîya xebat û berxwedaniyê ji bo hevçeperen xwe bi cî hêla (Kekê Selam Ezîzî endamê Deftera Siyasi yê PDK Îranê). Bê gman di boneyeke demkurt û zimanake nekemîlî wekî gotina min nahê kirin hemû ew xasmaniyêñ ku wan şehîden me, wan heval û rêberên me ku hebûn bêxim ber çavê xelkê. Ji aliyeke din ve jî renge eva jî gelek hewce nebe, çunkî ew hemû û nemaze Dr. Qasimlo ew hinde naskirî û navdar e ku kes nikare wî hinek ji keseke din pitir binasîne û ew kese bi xwe hinde nenas e ku keseke din dinase. Lê serbarê vî halî jî nabe îşare bi hin taybetmendiyêñ takekesî û rola berbiçav û bibandor ya wî di tevgera Kurd û zindîkirin û xemilandina Partiya Demokrat de nekin, Dr. Qasimlo kesayetiyeke bi ferheng, zimanzan, însaneñ mirovhez, bi wateya rastîn demokrat, bi wateya rastîn ya peyvê mirovekî siyasi û rîberekî jêhatî bû. Hemû ew taybetmendiyane jî ne tenê di karê siyasi û di pêvajoya xebatê de, belki di rabûn û rûniştinêñ rojane û di rû bi rû bûn tevî komikên biçûk û mezin de bi ronî û aşkira pê re xuya bûn. Miroveke rastbîn ku tu car hêvi û xeyal di cihê rastiyê nedidît. Rastî bi vî awayê ku hebûn, berçav

digirt, lewra jî qet yan bi kêmî tûşî şâşîyan dibû. Miroveke dûrbîn bû, xwediye ramaneke dûr û dirêj bû, ji bo rojêñ nêzîk û dûr yên neteweya xwe, gelê xwe û partiya xwe bi bername bû. Ew hemû zanistî û dûplomat bûne, ew li Kurdistanê, li Îranê û li derve jiyane, şîyan û karînek pê re dabû ku bikaribe rewşan baş binirxîne, bûyeran baş şirove û analîz bike û pêşdîtinê bike ku renge wê demê heke kesekê bibihîstiba yan bi nivîs bidîtiba, wisan bifikirîba ku tişteke dûrdest yan heta renge xeyalî be. Lê heke em mîzeyî raporê Kongreyan û civînêñ Komîteya Navnedî bikin ku wê demê bi fikra wî yan bi fikr û pêñusa wî hatine nivîsandin, em dibînin ku ew pêşdîtinêñ ku wî kiribûn, çîqas hev digirin û bi hev dişibin. Renge me di nav civaka Kurdevarî de yan di asta Îranê û herêmê de, gelek kesayetiyêñ zanistî, siyasi û civakî hebin ku xwediye hin taybetmendiyêñ xwe jî bibin, lê ewa ku Dr. Qasimlo ji hemû wan kesane û kesayetiyane cuda dike, eva ye ku hemû rihet û asûdeyiya xwe, hemû ew taybetmendiyêñ bilind û baş yên xwe, hemû zanista xwe, di xizmeta rizgariya netewe û gelê xwe de û ji bo bidestveanîna azadî û demokrasiyê di welatê xwe de kiribû. Xwe ji xweşîyan dûr xistibû, dijwarî hilbijartibû, dest ji zaf imkanatêñ jiyanê ku ji bo wî bidestxistina wan hêsan bû yan bidestxistibûn, berda. Li çiya, li bajar jiya, di hemûyan de tevî azadîxwazan û xebatkarêñ Partiya Demokrat û tevî Pêşmerêñ vê partiyê jiyan kir. Renge kêm kesayetiyêñ mezin yên din amade bibin wê xizmetê bike, ew hinde xizmetê bike û roleke hinde xuya û bibandor jî di pêvajoya tevgera Kurd de hebe. Heke ez nebêjim Dr. Qasimlo Partiya me ji halê mirinê sax û zindî kir, bi aşkira em dikaribin bibêjin ku Partî vejand, wêrane û xirabûyiye wergirt û koşkek li ser ava kir. Partiya Demokrat ji bê ser û beriy rizgar kir, ne tenê her vejand, belkî xemiland. Bi hinek taybetmendî, qanûn û pirensîpêñ dînyapesend û hinek qanûn û pîvan Partiya Dmokrat wisan xiste ber çavê raya giştî ku di nava Partiyêñ Kurdî da û hetanî di nava Partiyêñ Îranî û derve da bibe Partiyeke nimûne. Wî rîberiya giştî û bikom di nava PDK Îranê de cîgir kir. Ceribîna şoreşen borî, pêvajoya bûyeren dîroka Kurdan bo wî xuya kiribû ku heke şoreşek, tevgerek û, hereketekê azadîxwazane tenê bi hebûna kesekê ve bihê girêdan, ew kese her çîqas zana, bilîmet û jêhatî jî be, rojekê bi nemana wî kesî dê ber bi nemanê biçe. Lewra Dr. Qasimlo li ser vê baweriyê bû ku divêt rîberiya tevgerekê rîberiyeye giştî be. Bi ji nav çûna kesekê ji nav naçe. Bi ji meydan derketina ksekê lawaz û jar nabe û di hemû rewşekê de dê li ser pêyê xwe bisekinîne, li ser daxwaziyêñ xwe dê tekezê bike û pirensûpêñ xwe jî dê biparêze. Wî ji bo parastina serxwebûna siyasi û biryardana PDK Îranê hemû hewla xwe da û ew esla di partiyê de cî kir ku Partiya Demokrat divêt hazır bibe gelek nirx û buhayen bide, lê ci demekê nabe libek ji serxwebûna xwe ya siyasi ji dest bide. Ew li ser vê baweriyê bû ku heke di navbera hevaletiyeke gelek bihêz û dost de û di navbera parastina wê serxwebûna siyasi ya



partiyê de qirar be Partiya Demokrat û Dr. Qasimlo yekê hilbijérin, bê lîre û wêde divêt parastina serxwebûna siyasî ya Partiyê hilbijérin.

Dî vê derheqê de jî PDK Îranê nîrxên zaf dane, lê ewa ku Dr. Qasimlo anî û cîgir kir û parast, divêt em bo hertim biparêzin, ji ber ku mana Partiya me, mana tevgera me bi wê eslê ve girêdayî ye.

Hewildan ji bo navneteweyî kirina doza Kurd, pirseke girin bû ku Dr. Qasimlo bawerî pê hebû. Ew bawer bû ku nahê kirin û nabe doza Kurd di çarçoveyeke teng û bertesk de wekî dozeke hundirê welitekê bihê dîtin û xelkê din ji wê bêdeng be û bi çavê dozeke hundirê welitekê bihê mêze kirin. Pêkhatina yekemîn Konferansa Navneteweyî ya Kurd li Parîsê ku bi hewl û xebata wî pêk hat û – mixabin nekarî tê de besdar bibe û mixabin demekê berî pêkhatina wê Konferansê şehîd bû – lê Konferans berhemâ fikra wî bû, encama wê jî her ji bo hewil û tekoşîna wî zivirî.

Baweriyeke kûr bi hevqederiya neteweya Kurd hebû. Di vê derheqê de jî ji bo bihêzkinin û xurtkirina seh û ruha neteweyî dixebeitî. Ew li ser vê baweriye bû û niha jî em wekî Partiya Demokrat li ser vê baweriye ne ku Kurd neteweyek e, Kurdistan axek e ku hatiye parve kirin û xelkê wê jî ji hev dûr ketiye. Eger rojekê ew netewe bixwaze, xorten wê netewê bixwazin bibin xwediyê dewleteke xweyî, eva mafê bê lîre û wêde yê wan e, heke ji dîtingeha neyar û dijberan ve cudahîxwazî bihê hesibandin, ji dîtingeh û bi çavê Kurdan hevgirtin û yekbûn e. Lê serbarê vî halî jî her wekî di basa rastdîtinê de min işare pê kir, di siyasetê de li ser bingeha rastiyâ kar dikir û li gorî rastiyâ û rewşan siyaset, rê û rîbaza diyarî dikir. Baweriyeke kûr bi alîkariya hêzên kurdistanî di parçeyên dîn yên Kurdistanê hebû. Her li gor wê hevqederiya ku bawerî pê hebû. Lê zanî jî ku xebata Kurd di her parçeyekê de hewcehî bi pişa qadekê heye, ku hilkevta Kurdistanê wisan lê kiriye û niha jî wisan hil digire ku pişa qada her parçeyekê welitek be, dewletek bibe ku bi xwe jî tevî pirsa Kurd di vî parçeyê de rû bi rû be. Lewra ew bawer bû tevî wê çendê ku meşrû e ku hêzeke Kurdi-

yan xebata Kurd li parçeyekê pişa qadê hebe, nabe tevî wî welatî ku bi xwe jî pirsgirêka Kurd heye û bi xwe pê re rû bi rû ye, ew hinde biçe pêşê ku vegeryan ji bo wî nebe. Nabe Kurd ku wekî pişa qadê ji her parçeyeke din yê Kurdistanê mifahê distîne, karekê bike tevî hikûmeta desthilatdar bi ser wî parçeyî ji Kurdistanê ku bi ziyan û tevgera gelê Kurd di wî parê de xilas bibe. Ev bîr û ramane wî çaxî daket û di partiyê de cîgir bû û niha jî partî peyrewiyê jê diket.

Dr. Qasimlo ku bi xwe mirovekî xwedî çand û ferheng û modern bû, tev hevala wî jî eva bû ku di partiyê de wêjeyekê cîgir bike ku nûjen û modern be. Partiya Demokrat bi zimanekê biaxive ku zimanê belge û têgihîjandinê be, tûrebûn û berçavtengî pêre xuya nebe. Gotineke sivik û dijûndan bo ci aliyekê lê nekeve û eva edebiyatek e û zimanek e ku niha jî partiya me pêre dipeiyve û dezgehêne me yên ragihandinê bi tevahî di karê xwe de berçav digirin.

Dr. Qasimlo ew kesayetiye bû û ew xizmetanê bi tevgera Kurd û Partiya Demokrat kir. Lê tenê milkê Partiya Demokrat û gelê Kurd li Kurdistanê Îranê nebû, ew azadîxwaz û mirovhezek bû ku di asta herêmî û cîhanî de naskirî û navdar bû. Dî karê siyasî û diplomasiyê de ew hinde pispor û jêhatî bû ku di her kom û civînekê de te bidîtiba û di xizmeta wî de bibûya, te didît çend ser li ser serê hemûyan e û zimanê wî yê têgihîjandin û bi belge çend bihêz e ku bi rihetî û hêsanî dikare nifûzê bike ser kesen hember.

Ji destçûyîna kesayetiyeke wisan û rîbereke bi wî taybetmendane ve û rola bi vî awayî ya wî ku di Partiya Demokrat de hebûye, mezinahî û serfiraziyek e ku di asta navneteweyî de ji bo Kurd û di asta Îran û cîhanê de ji bo azadîxwazan hebûye, bê guman Dr. Qasimlo dike milkê hemû aliyekê û xema ji destçûna wî jî dikeve ser milê tev aliyekê.

Ewa ku Dr. Qasimlo afirand, ewa ku Dr. Qasimlo di PDK Îranê de bicî kir, cîgir kir, egera ev pirensîpênu di partiya me de misoger bûn, neban, piştî Dr. Qasimlo Partiya Demokrat ev Partiya Demokrat nedibû. Lê pirensîp û taybetmendiyen Dr. Qasimlo li cem fidakariya şagirdên Dr. Qasimlo, piştî Dr. Qasimlo ev partîye her wekî Partiya Dr. Qasimlo wek partiyekê ku siya Qasimlo herdem li ser seriye û di bin siya bîr û raman, siyaset û rînşanê wî de rîbaza wî dişopînin.

Ev çenda ku civîna me ya vê carê piştî 16 salan terora Dr. Qasimlo ji civînen salên borî cuda dike, eva ye ku me wê demê dît ku dewleta Otrîşê tevî vê çendê ku destûr û fermanderên teroran xuya bûn, birêveberiya terorê xuya bû, cihê wê diyar bû, heta gunehbar, aliyê kêm 2 ji wan ketine destê Polîs, mixabin dewleta Otrîşê, ne tenê bi vî awayê hewce li şûn dosyeyê neçû, belkî heta navbera terorkar û terorkirî de, di navbera Komara İslâmî û Partiya Demokrat û gelê Kurd de qet wekî dadwer kar nekir. Belkî wekî dozger dilîvî, hemû buhayê demokratik ku rengê vê hindê dida bawerî pê hebû û bawerî pê heye, bin pê kir. Xwîna rîberê Kurd kire fidayê qazanc û berjewendiyen xwe. Xala ku min got vê carê ferq heye, eva ye ku li derdora 16 saliya terora Dr. Qasimlo de û piştî hilbijartina Mehmed Ehmedînejad di gera nehem ya hilbijartina Serok Komariyê de, wekî Serok Komarê pêşin yê Îranê, derket ku ew Serok Komare jî wekî Serok Komarê wî çaxî ku yek ji fermanderên terorê bû, ew jî bernamerêj û gelaledarêjê terora Dr. Qasimlo bû. Ji bo me tiştek rohn û eyan e, ku Komara İslâmî dijinîne Kurd û bikujê Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên me yên din e, lê dengvedana vê pirsê careke din doza dosya terora Dr. Qasimlo ku Otrîşê bi neheqî wî çaxî renge bi du sedeman xiste pişt guhê xwe û bixe ber çavê raya giştî ya Otrîşê ku wî çaxî û renge niha jî têkiliyeke berfireh ya aborî û bazîrganiyê, berçavgirtina gelek siyasetan li hember Komara İslâmî hebû. Ji bilî vê çendê ku nekarî çav ji berjewendiyen xwe yên aborî bimiqîne, xaleke lawaz jî di ber destê Komara İslâmî de bû, wî çaxî

ku şerê Îranê û Îraqê hebû, Otrişê li gorî qanûnê nedikarî çekan bi ci yek ji aliyên şer bifiroşe, bi her du aliyên şer firotibû. Bi Ordinê re firotibû, Îraqê pareyê vê dabû, bi Lîbiyayê re dabû, Îranê parê wê dabû. Heke wê demê Komara İslâmî eva li ser Otrişê aşkira bikiriba, renge kar gihiştiba cihekê ku dewleta wê demê ya Otrişê neçar maba dest ji kar berda, him ev xala lawaz ku ew jî her ji qanûn şikandinê û karê nebaş çavkanî digirt û him jî helwesta ne jêhatî ya Otrişê bû sedema wê çendê ku ew dosye ji wê demê were heta niha jî tevî de be, bi awayekî daxistî bimîne, hemû hewl û xebata PDK Îranê û malbatên şehîdan û gorîyên bûyera 22'ê Pûşperê bê encam ma. Niha doz ji wê derbas bûye, em hêvîdarin raya giştî û dewletên bîhêz zext û gîvaşê bêxin ser dewleta Otrişê ku rî ji bo lêkolînkîrin ji dosya terora Dr. Qasimlo û hevalên wî vekirî bîhîte kirin û careke din jî şermezariyeke din wekî mehkûmbûna Mîkonosê ji bo Komara İslâm bi dû re be.

Hevalên rîzdar:

Di wan boneyane de em tenê ji bona vê çendê ku rîz ji kom nabin bîranîna Dr. Qasimlo bigirin yan xema ji dest dayîna wî nû bikin, çunkî Dr. Qasimlo her dem di bîra me de ye û tevî me ye, di jiyanê de, di xebat û tekoşîna siyâsî de, eva nine ku her rojekê ku em diaxîvin, dînîvîsînin, ku dibêjin û lêre û wir amade dibin, lênihîrînekê ji raman û nêrînê wî didin. Ku wisan e Dr. Qasimlo hertim di bîra me de ye û hewce bi bîranînê nine, yanî nahê ji bîr kirin, heta bihê bi bîr xistin, xem û kula wî jî ew hinde giran û nexwîs e ku qet li ser dilê me sivik nabe heta em nû bikin, ku wisan e meremeke din ji wan civînane eva ye ku careke din di wê boneyê de wefadariya xwe bi Dr. Qasimloyê nemir, Sekreterê Giştî yê Partiya me, bi wî kesayetyî hêja û jêhatî ku di asta navneteweyî, herêmî, Îranê û Kurdistanê de nav û deng derxistibû, dubare bikin.

Em divêt li ser wan isûl û pirinsîpan pê biçeşînin yên ku ji me re diyarî kirine, raspardeyên wî li ber çavê me bin ku her dem wekî çira ber pêyê me ronahî dike û ewa ku em li kuderê de biçin, ji ci biselîmînin, ber bi ku biçin. Di vê civînê de em wê sozê dubare dîkin ku Dr. Qasimlo herdem ji bo me xalek e ku em çavê xwe jê derbas dîkin. Herdem hêz, pişt û penah e ku di pêvajoya domandina rîya rizgariya me de û ji wê jî pitir em hêvîdarin bi hewl û xebata zaf ya me bi hevgirtin û xwe gorîkirina me ya pitir hêviyê Dr. Qasimlo jî bi cî bînin û wisan bikin ku riha Dr. Qasimlo şad be, ji me razî be wekî hemû şehîdîn din.

Silavan dişînim ji bo riha pak û canê paqîj yê Dr. Ebdulrehman Qasimlo rîberê jêhatî yê Kurd, siyasetvanê navdar û bi nav û deng, Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat ya Kurdistanâ İranê

Silav ji canê paqîj yê şehîd Ebdula Qadirî Azer û Dr. Fazil Resûl

Silav ji canê paqîj yê kekê Selamê Ezîzî û hemû şehîdîn rîya azadiyê

Hûn jî her şad, silamet û serkevtî bin.

Rêzgirtin ji 16'mîn salvegera Şehîdkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî li bajarên Kurdistanâ İranê

Bi hinceta roja 22'ê Pûşperê, 16'mîn salvegera terora Şehîd Dr. Qasimlo û hevalên wî bi destê rejîma terorîst ya Komara İslâmî, endam û alîgirîn xebatkar yên PDK Îranê li piraniya bajarên Kurdistanê de xebatên rîzgirtin û bibîranîn birêve birin.

Li Urmiyê bi taybet li devera Mirgewer û li piraniya Gund û herêman, di xebateke piropagendeyî de Filma jiyannameya Şehîd Dr. Qasimlo, tirakt û dirûşmîn şoresserane yên siyâsî bi dijî rejîmê hatine belav kirin.

Li bajarê Sine di xebateke berbiçav û balkêş ya piropagendeyî de jiyanname û wêneyên şehîdî nemir Dr. Qasimlo û Arma PDK Îranê û dirûşmîn şoressvanî û siyâsî hatin avêtin.

Li Mehabadê xelkê gişt bazar û dikanê wî bajarî girêdan û herweha zêdetir ji 2 hezar kes ji ciwanên xebatkar yên Mehabadê agireke mezin hilkirin û dest bi gotina dirûşmîn hîzbî kirin.

Li Rebetê jî demjimîr 9:30 ya Şevê bo rîzgirtin ji canê paqîj yê şehîdîn Viyenê li Girê Serçawê 3 agirêne mezin hatin hîlkirin.

Li Serdeşte de jî di xebateke berfireh ya piropagendeyî de wêneyên Şehîd Dr. Qasimlo û daxuyaniya Kongireya Neteweyê İranâ Federal hatin belav kirin û der û dîwar bi dirûşmîn Hîzbî hatin nexşandin.

Herwiha li Merîwanê, Bokanê, Kırmaşanê, Seqiz, Makû, Bane, Hevşar, Şîno, Pîranşar, Nêxede û gelek bajarên din yên Kurdistanê de jî wêneyên Şehîd dr. Qasimlo, tirakt û arma PDK Îranê hatin belav kirin û der û dîwar bi nîvîsına dirûşmîn hîzbî hatine xemîlandin.

Hunermendê mezin yê muzîka Kurdi, Mucteba Mîrzade koça dawî kir

Roja sêsemî 19.07.2005'an, hunermendê mezin yê muzîka Kurdi Mucteba Mîrzade bi sedema nexweşîya dil di temenê 62 saliyê de çû ber dilovaniya xwe. Hunermend Mîrzade sala 1324'ê Rojî (1936)'an li bajarê Kırmaşanê ji dayîk bû.

Mîrzade dibêje ku bedewtirîn dema kar û xebata xwe ya muzîk çekirin û hunerî li Kırmaşanê bûye ku li wir tevî **Hesen Zîrek** û piştre jî **Mezher Xalîqî** alîkarî kiriye.

Riha wî hunermendê mezin yê muzîk û hunera Kurdi şad be.



Demokrasî, buha û piratîka wê

Wekheviya ramyarî û edalet di piroseyên demokratik de

Destpêkeke kurt

Di vê besê da métodên demokratik yên pêwendîdar bi edalet û dadperweriyê dê bê gengeşê kirin. Mijarek ku me di besên berê de basa wê nekiriye. Adilbûna hilbijartinan bo nimûne dikaribe bi wê wateyê bê, ku mafê dengdanê li tu kesê nehê standin û hemû kêmâniyê nav civakê bikaribin bi awayekî yeksan beşdariyê di hilbijartinan de bikin yan jî şêwra çawedêrî li ser hilbijartinan alîgiriyê li tu berbijar yan partiyêne beşdar li rikeberiya hilbijartînê neke û dengê welatiyan bi awayekî yeksan bê berçav girtin û hesab bo hemûyan wekî hev bête kirin. Bi vî awayî encama hilbijartinan jî dê ji aliyê hemû beşdarê hilbijartînê bê qebûl kirin.

Wekhevî û edaleta biryaren siyasi dikaribe herwisa bi awayekî normatîv û ji rîyêne yasayan bê misogerkirin, bi awayekê ku her takeke civakê bi yeksanî bê berçav kirin.

Di demokrasiyên Rojava da nemaze di welatên Skandînavî de ramana yeksaniya siyasi gelek giring û berçav e. Lê ewa tê ci wateyekê? Pirsyarek ku ji bo me endamên neteweya Kurd tê pêş ewa ye ku erê gelê merca yeksaniya siyasi di gel mafê dengdanê, biryara li ser bingeha piraniye ye yan jî tiştek din? Bo bersîvdan bi wê pîrsê em dê nîrîn û teoriyên çend demokrasîzanan pêşkeşî xwendevanan bikin.

Wekheviya siyasi ji dîtingeha desthilata piranî

Li sala 1952'an civaknasê Amerîkî "Kennetch May" hizra desthilata piranî di mîzegeha hilbijardeya civakî xiste ber lêkolînê. Li gor wî hizra desthilata piranî hetanî astekê dadperwerane tê berçav kirin. "May" çend rê û métodan ji bo dadperwerane bûna biryardanê li ser bingeha piraniye deng pêşniyar dike. Li gor wî biryara li ser bingeha dengê piranî tenê rîya hilbijartina civakî ye ku mercen jêrin pir dike: (1) Nepenîti (deng dana bi nihêni) (2) bêalîti (3) nûnerayetiya pozetîv (4) rîya çareseriye

Kurmanc Hakkî
kurmancakkî@yahoo.com

Armanc ji nûnerayetiya pozetîv (xala 3) ewa ye ku bo nimûne ger prefirênsa (hilbijardeya) dengder x baş be û bê hilbijartin, pileya civakî ya dengder x



jî dê ber bi pozetîv biçe. Merem ji nepenî bûna (xala 1) deng ewa ye ku dengê her kesekê bêy berçav girtina zayend, kesayetî û pileya civakî û aborî ya welatiyan dengê wana bi awayekî wekhev tê berçav kirin û hesab kirin.

Li gor "May" merca nepenî bûna deng ewa ye ku prefirênsa takekesan wekî hev bê berçav kirin. Her yek ji wan wekî hev kar bikete ser encama dengan. Dengê nepenî merca wekheviya siyasi hatiye zanîn. Li gor merca nepeniya "May" pirêfîresa (hilbijardeya) her kesekê diviya bi awayekî wekhev bê berçav kirin, bi awayekê ku encama hemûyan bi yeksanî bê bi dest xistin.

Bêalîti bi vî awayî tê ku çawa métoda hilbijartînê altînatîvan berçav dike. Merca bêalîtiyê ewa ye ku sistem tu altînatîvan li ser xelkê ferz nekt yan jî propagandê bo neket. Li gor wê dîtinê eger bêt û prefirênsa dengderan bi awayekî şas bihê guherîn dê encama dengan jî bi awayekî şas bihê guhartîn. Her çend Komara İslâmî ya Îranê bi tu awayekê demokratik nine, lê ji bo şîrovekirina basa xwe em dê wilo dabînê ku hilbijartînê Serok Komariya Îranê demokratik in. Her wek di mînaka hilbijartînê gera 9'an ya Serok Komariya Îranê de hat xuyanî kirin bi alîgirîya dam û dezgahê ragihandinê û navendê desthilata Îranê kesek nenas bi navê Mehmûd Ehmedînejad bû Serok Komarê

Komara İslâmî. Dam û dezgahê desthilata Îranê li hember Refsencanî û Ehmedînejad de bi awayekê kar kirin ku gelekan li hilbijardeyê xwe wate Refsencanî dest kêşan û encama wê beravajî bûna pêşbîniyê gelek siyasetvan û karnasên siyasi bû.

Gelo çawa nepenîti û bêalîti dê di hilbijartînê kollektîv de bê cî bi cî kirin? Em bi asanî dikaribin çend minakan di vî warî de bînin berçav ku hertim nepenîti û bêalîti nayê parastin. Çunkî li gor dîtina "May" bêalîti û nepenîti di mercekê de dê bê parastin ku altînatîvan hilbijartînê ne zêdeyî du duyan bin. Hinek teorîzanê demokrasiyê li ser vê baweriyê ne ku nepenîti di dengan da tu watayekê nade. Li gor dîtina wana diviya pileya xwendin, cihê civakî û aborî ya dengderan bê berçav kirin û bi vî awayî dengan li gor dengderan qursayı û nirxa xwe jî hebe.

Ji bilî qursayıya civakî ya dengan ku cihê bas û hêviya me jî nine, dabeşkirina welat yan nawçeyekê di ser çend herêm an navendê dengdanê merca nepenîtiya hilbijartînji nav dibe. Bo nimûne di hilbijartînê Serok Komariya Dewletîn Yekbûyî yên Amerîkayê de ew merce cî nagire. Ji ber ku di hilbijartînê Amerîka da giring eva nine kê zor aniye, giring ewa ye ku piraniya dengan li kîjan Eyaletê bi berbijarê Serok Komariyê hatiye dan.

Di hilbijartînê Parlementî de merca hatin hilbijartîn piraniya reha¹ nine, belki piraniya goreyî ye (*Status quota*)¹. Yanî li gor wê yekê ku aliyê kêm yê dengan bo hatin hilbijartîn ji bo Parlementê çiye ew kesen ku wê zêde tîrin yan li gor zêdeyiya dengan tê hilbijartîn. Li hinek sistemân ji li gor dabeşbûna alîgirîya partîyen siyasi yên hatî hilbijartîn tê xuyanî kirin. Dadperwerane bûna şewazên hilbijartîn tenê parâ wê naked ku darêjerên siyasi edaleta civakî berçav bigrin. Merca yeksaniya siyasi diviya xwe li gelek ciyên pêwendîdar bi biryara gel nişan bide: Bo nimûne li hilbijartîna agêndaya siyasi û heta pêkanîna hizra siyasi jî diviya bê xuya kirin.

Doma wê bo hejmarek din.

¹ اکتریه مطلق
¹ نسبی

Destê xwe yê qerêj ji ser gelê me li Rojhilatê Kurdistanê rakin

Cankurd



Wekî sîistema Şahê İranê bûye qurbana hovbaziyên xwe yê mezin û gelên İranê ew sîistem bi darê zorê roxandine, diyar e ev sîistema terorî jî, ya ku kurkekî derewîn li ser navê İslâmî li xwe kiriye û ji zû ve rastîniya wî bo hemû cîhanê diyar e, dikeve wan şâsiyên Şah M. Riza, û wilo temenê xwe kintir dike û roxandina xwe bj xwe nêziktir dike.

Şahê İranê ket şâsiyek mezin, dema hêzên xwe dijî serhildana gelên İranê derxistin kolan û xiyaban, wan hêz li hember fedekarî û bîryara gel jar bûn û nema dikarîn sîistema wî biparizin. Di dûrokê da jî her wilo bûye, gava desthilatdar û gel dijî hev dibin, hêza leşkerî dest bi bedkariyên xwîni dike, lê paş demekê dibîne, ku ji berjewendiyên wê hêzê ye, xwe bide aliyê gel û dev ji desthilatdar berde.

Lê belê wilo dibe, gava teviya gel li hember desthilatdar bi hev re rabe, hema gava parek seriyê xwe hilde û parêñ dî jî destgirêdayî û wek temaşyan di mala xwe da rûnin, hîngê rewş wêrân dibe û hêza leşkerî û hêminî bi desthilatdariyê re dimîne û

hovbaziya wê bi cih tîne, wek acetek xwînjandinê kar dike. Ew parê gel, ku serê xwe hildaye, di xwîna xwe da digevize û ew serhildan tê vemirandin.

Em di dûroka nûjen da jî vê yekê dîbînin. Çawa Kemalîstan hemî serhildanê gelê me li bakurê niştê me yek û yek bi darê zorê, bi xwînrêtinê û bi qirkirin û wêrankirinê pelixandin û vemirandin. Bo çî? Ji ber ku parek ji gel radibû ser pêyan û para mezin jî di mala xwe da bêliv daniştibû, wekî ev kêse hîc ne ya wan e.

Li Sûriyê jî sîistema Esed di sala 1980'an da serhildana bajarên Hema û Helebê bi xwînjandinek mezin şikandin û di sala 2004'an da serhildana gelê Kurd tepisand, ji ber ku dîsa parek ji gelê Sûri tev li serhildanê bû ne teviya gel.

Îro li Rojhilatê Kurdistanê, ji ber îşkencekirinê, wêrankirinê û darvekirina mirovan bi şêweyekî hovane, ji ber nasnekirina nasnameya neteweyî ya gelê me, ji ber talankirina xêr û bêrên Kurdistanê û ji ber binpêkirina mafêñ mirov, êdî gelê me yê qehreman nema vê yekê dipejirîne.

Ev serhildan terzek ji terzêñ bi cihanîna mafê çarenivîsê ye, ew mafê di peymanên navneteweyî da hatîye parastin û dewleta İranê jî ïmze û şeqleya xwe li binî daye.

Rewşa cîhanê hatîye guhartin. Di dema Şah da du xendek stratêj li hember hev hebûn, ya Sosyalîst û ya Kapitalîst. Îro ne wilô ye. Di dema Şah da bîryarek neteweyî ya bo ketina hundir welitekî bi egera parastina mafêñ mirovan tune bû. Paş ku Sedam Husêñ di sala 1991'an da hêrişa xwe ya xwîni aniye ser gelê me li Başûrê Kurdistanê, Neteweyen Yekbûyî di encumana xwe ya hêminiyê da bîryarek bo rawestandina wê hovîtiyê di nav sînorêñ fermî yên dewleta İraqê da stand û bi teherekî leşkerî ew bîryar bi cih

anî. Ev bîryar çavê desthilatdarên İranê jî ditirsîne, lê gelek pêwîste, ku bangeşîniya "mediya" Kurdî hovîtiya vê sîistema terorê baş bide ber çavê cîhanê. Mixabin! Di vir da karê Kurdish wek her car qels e û bangeşîniya Kurdî ketiye bin basikêñ partîniyê.

Hêzên ramyarî yê neteweya Kurd, wekî çawa piştvaniya serhildana başûrê Kurdistanê di sala 1991-1992'an de kirine, ji sala 1984'an da bi histobariya xwe ya neteweyî bo bakur rabûne û gelek şehîd di rîya azadiyê da dane û sala 2004'an li serhildana gelê me li Rojavayê Kurdistanê derketine, dê bêguman di ber gelê xwe da li Rojhilatê Kurdistanê jî bi erkîn xwe yê biratiyê û hevmaliyê rabe. Ne di şahiyê da û ne jî di tengiyê da, çî hêz li cîhanê nikare vê neteweyê paş dayîna evqas şehîd û paş evqas hişyarî ji hev cuda bike.

Desthilatdariya terorî li İranê destê xwe yê zorê daye ser gelê me, her û her bizavê dike, kubihna serhildanê di sîngê gelê Kurd da bifetisîne, lê ew nema dikare, ji ber ku rewşa cîhanê bi tevayî hatîye guhartin û neteweya Kurd jî di van bîst salêñ dawîn da pir gavêñ mezin di hişyariyê da avêtine. Paş wan gavêñ berçav ên li Başûrê Kurdistanê, êdî kîşeya Kurdî di cîhanê da deng vedaye. Kurd bîhêz bûne, bêtir hatîne naskirin, ku ewan bo azadiyê û demokratîyê dixebeitin û derewêñ neyârên wan berbad bûne, yek û yek çarîkên wan ên qerêj hatîne cirandin.

Raste ku gelên İranê yê dî niho li gelê me destgirêdayî û bêliv û bêşiv temaşa dikin, lê ewê binzor bibin, ku ciyê xwe diyar bikin, ka ewan li gel serhildana azadiyê ne an li dij in.

Histobariya hêzên neteweyî û demokrat ên Kurd jî eve, ku wan gelan û hemû gelên cîhanê û azadîxwaz û aştîhezan bi ser xwe ve û bi ser serhildana gelê xwe ve bikişînin. Hingê dê desthilatdariya terorî ya İranê binzor bibe, ku destê xwe yê bi xwîn ji ser gelê me rake.

18'ê Pûşperê û Bizava Xwandekarî li Îranê

Dara Natiq

Bizava Xwandekarî wekî hêzékî ektîv û çeleng her tim di tevgera azadîxwazane a gelên Îranê de û di pêxema avakirina hikûmetekî demokratîk û gelî de, rolekî berbiçav û bibandor lîstiye.

Avabûna zanîngehan li Îranê û jêhêcûna hejmara xwandekaran di welêt de û herwiha ew rewş û zirûfa nîve azad a ku di çaxê desthilatdariya Riza Şah de pêk hatbû, bûne sebebê geşekirina Bizava Xwandekarî di Îranê de. Lê mixabin piştî vê çendê ku Mihemed Riza Şah hate ser kursiya desthilatê, tev ev azadî û derfetane jî hatne asteng û qedexe kirin û ev bizave bi girtin, tepeserî û hepsî kirinê re berengar bûn û rayedarên vê demê yên hikûmeta navendî bi awayekî hovane roja 16'ê Sermaweza 1332'ê Rojî îris kirine ser xwandekarê zanîngehê ku ji wir pêde ev roje wekî **Roja Xwandekaran** hate bi nav kirin. Serbarê ew hemû zext, givaş û tepeseriyan ku ji aliyê hikûmeta navendî ve berengarî vê bizavê dihate kirin, lê ne tenê ev girkane nehate temirandin, ji ber ku roj bo rojê ektîvtir bû û di her qonaxek ji xebata azadîxwazane ya xelkê Îranê de bi taybetî xebat bi dijî dîktatoriye û serhildana gelên Îranê bi dijî rejîma Paşatiyê di sala 1357 (1979) 'an de rola xwe ya jêhat û bi bandor leystiye.

Piştî hilweşandina rejîma Paşatiyê û bi talan birina destkevtên şoreşê ji aliyê komek Melayêñ kevneperek ve ku bû sebebê avabûna sistemekî kevneperek û totalîter, Bizava Xwandekarî jî tevî rewş û zirûfkî taybetî berengar bû.

Rayedarên Komara İslâmî, her di destpêka desthilata reş ya xwe de gihiştne vê baweriye ku dirûşm û girîngiya bizava resen û radîkal ya xwandekaran, antî têza sistema kevneperek û azadîkuj ya vê rejîma serberedayî ye. Ku wisan

bû ev rejîme her ji yekem roja desthilata xwe ve hetanî iro, bi penah birin bo komek pîlanên dijî gelî wek: koditaya çandî, avakirina saziyên destçekirî û danana komek filterên idolojîkî yên cur be cur, bi merema pêkhateyeke paradoksîkal bi navê Xwandekarê Misilman yên pêrewê rêya Îmam, hewl daye û dixebite ku vê bizava pêkhâtşikên û radîkal ya xwandekarî ji sîkla guhartinên girîng yên çarevîssaz veresîne.



Her lewra xwandekarê welatê me bi berçav girtina van rastiyêñ jorîn û bi merema derxistina rûçikê nedemokratîk yê sinaryoya destçekirî a Réformwazên Hikûmetê û fend û fêlên pirxapêner yên wan, seva pêncsemîyê 17'ê Pûşperê sala 1378'ê Rojî meşekî nerazîbûnê derheq bi guhartina yasaya çapemeniyê û daxistina Rojnameya **Selam** birêve birin. Her li dîv vê meşê roja 18'ê Pûşperê hêzên dijî gelî ên rejîmê bi terzekî hovane îris birne ser Zanîngehê û bêrehmane ketne canê xwandekarê kur û keç, hejmarek zaf ji wan birîndar û rapêçî zîndanê kirin û çend xwandekar jî hatne şehîd kirin.

Bûyera 18'ê Pûşperê ne tenê bû sebebê türeyî û vêzariya xwandekarê zanîngehê seranserî

welat, ji ber ku kerb û nifreta tev qat û texên Îranê bi xwe ve girt. Bi dîv vê kiryara tepeserkarane a rejîmê de bû ku pişkek zaf ji xwandekekan ji xwandin û jiyana xwandekeleyê hatne bêpar kirin û rapêçî girtîgehê hatne kirin. Herwiha rêveber û sûgdarê vê kiryara nemirovane jî ji aliyê celadêñ rejîmê ve hatne xelat kirin.

Ev riftara nemirovane û dijî gelî a rejîmê li hember xwandekekan û bizava xwandekarî bû sebebê vê çendê ku perde li ser rûçikê baskê naskirî bi Guhartinxwaz di nava desthilatê de, ku diholâ piştevanî ji xwandekekan û tagirî ji daxwazêñ wan dikutan,bihête vêdedan û bizava xwandekarî bi dûr ji rikeberêya nava desthilatê, ber bi rêya rastîn ya xwe û bidestveanîna armancêñ bingehîn yên xelkê Îranê ve bilîlivlin.

Ev bizave cuda ji vê çendê ku pêl avête nava zaf zanîngehêñ welêt, lê di hemen demê de tevî piştevaniya piraniya gelên Îranê berengar bû. Di rastî de û bi kiryar bû bizavekî xelkî û xwandekarî. Dirûşmîn vê bizavê tenê eyankerê daxwazêñ sinfi û xwandekekan nebûn, ji ber ku daxwazêñ bingehîn û esasî yên tev xelkê Îranê bi xwe ve girtibûn û Komara İslâmî di tevahîya xwe de mandel dîkir.

Bi berçav girtina tev rastiyêñ jorîn û rol û ektîv bûna meşa azadîxwazane ya 18'ê Pûşpera 1378'ê Rêjî, girîngî û resanayetiyeckî zêdetir da bizava xwandekarî, lewra bi heq hewce û hêjayî vê hindê ye ku hemû salekê yad û bîranîna vê rojê bihête kirin û rêz ji fidakarî û çelengiya vê bizavê bihête girtin. Bi taybetî em di çaxekê de réz ji yad û bîranîna şeşemîn salvegera vê rojê digirin ku guhartinêñ cîhanî û demokratize kirina Rojhilata Navîn pêvajoyeke bileztir bi xwe ve girtine û bandora wan guhartinane û nerazîbûna gelên Îranê ji Komara İslâmî û zext û givaşen navneteweyî bo ser Îranê seba binpêkirina mafêñ mirovan, piştevanîkirin ji hêzên terorîstî, bîdestxistina çekêñ Etomî û hwd... bi tevahî rewati û rûçkê biyom yê Komara İslâmî biriye bin pirsyarê û rejîm ber bi qederekî reş û nedîyar ve diçe.


Rojeva siyasî ya Îranê piştî hilbijartinê

Selîm Zencîrî

Aqibet piştî 2 geran, şanoya hilbijartina Serok Komariya Îranê bi pişikdariya kêm a xelkê bi dawî hat. Di encam de Mehmedînejad ku tu kesê çavnihêriya serkevtina wî nedikir, bû bi Serok Komarê Îranê û hemû siyasetvan û raya giştî ya cîhanê hmatmayî kir.

Çend rojan piştî hilbijartinê, civaka cîhanî nigeranî û reşbîniya xwe di vê derheqê de da eyanê, lê rejîm jî dixebite ku pişikdariya zaftir a xelkê û rewatî û meşrûiyeta xwe bike alavek ji bo kêmkirin û ji nav birina zext û givaşen cîhanî. Lê kesyetî, karname û rabihoriya tarî û reş, cinayetkarî û terorîstbûna Ehmedînejad, ne tenê zirûfa wî, belkî rewşa Komara İslâmî jî di pêwendî û hevkêşeyên navneteweyî de aloz û pir xetertir kiriye.

Desthebûna wî di girtina Balyozxaneya Amerîka di 13ê Xezelwera 1358'ê (1980) Rojî û herwiha pişikdariya wî di terora râberên opozisyûna Îranê wekî: Dr. Qasimlo di 13'ê Jujuuya 1989'an de, radîkal bûn û siyaseta wî bo domandina pirogramên Etomî zirûfek afirandiye ku civaka cîhanî bi giştî û bi taybetî Amerîka ektîvtir ji caran kiryarên rejîmê eşkere û şermezar bikin û dijberiya xwe jî roj bi rojê xurtir û berfirehtir bikin, herwiha ewropa jî neçar kiriye ku lênihîrînekê bi ser siyasetên şaş yên



Mehmedînejad

xwe derheq bi Îranê de bike.

Îran piştî hilbijartina nehem, bi qonaxekî nû ji jiyana siyasî a xwe re rû bi rû bûye, qonaxek ku ew bi şoreşa sêyem bi nav dibin, qonaxek ku desthilatdarî yekdest bûye. Bêguman destê rejîmê jî di pêşvebirina siyasetên xwe de vekirî bike û rejîm jî dê hêz û şiyana xwe ji bo berengar bûn li hember nerazîbûnê hundirî û derveyî bihêztir bike, etmosfera siyasî, civakî û hiqûqi ya Îranê dê bertengtir bike, lê di encam de, dê bihayeke girantir ji bo rejîmê hebe.

Hilbijartina Ehmedînejad û pêkhatina hikûmetâ yekdest a wî dê bandora nerêni li ser warê: peywendiyê nava hikûmetê, peywendiyê hikûmetê tevî xelkê, peywendiya hikûmetê tevî civaka cîhanî bike.

Yekdest kirina hikûmetê tu car bi sebeba raman û dîtinên takekesî û îdeolojîk li ser piraniya sistema siyasî cihgîr nabe û dê nerazîbûn û

valahîyan biafirîne, eva jî di halekê de ye ku pawanxwaziya Wilayeta Feqîh bi zêrevanîkirin li ser hemû beşen nîzama siyasî a welêt hetanî niha nirx û buhayekî mezin daye. Bo mînak bê otorîte kirina hêdî hêdî a Refsencanî ji deshilatê ku çaxekê bi mîrê rojê tengav yê rejîmê hatibû binav kirin.

Ji aliyê din jî bê hitbar bûn û şikestxwarina binav reformxwazan di her 2 gerên hilbijartinê de û bêdengî û nerawestana wan li hember fêl û şâsiyên hilbijartinê de derbekî mezin ji reformxwazan da.

Civaka Îranê

Hilbijartina Serok Komariyê, di nebûna hêzên demokrat û nedewletî, di nebûna azadiya hilbijartinê de birêve cû, lewra nikare bibe bi rûckê rastîn yê civaka Îranê. Ji ber ku dengdana pareke kêm ji xelkê Îranê bi Ehmedînejad nikare zîr û ziyana ku di navbera Wilayeta Feqîh û civakê de afirîne, tola wê veke. Parek ji dengdêran ji ber zext û givaşen hêzên Besicî û Întizamî, pareke din ji bo rîzgarkirina xwe ji destê nedarî û belengaziyê li dû tîrojkeke hêviyê digerîyan, û deng jêre dan, pareke din ji ber wê ku dijatî tevî hikûmetê hebûn û Ehmedînjad li hember Refsencanî de kesek nenas bû. Para din ji ber mandî bûn ji Reformxwazan Hikûmetî ku nekarîn qewl û sozên xwe bi cih bînin, para din bi sedema wê ku navbirî mirovekî radîkal, parêzerê nîzamî û helandî di Wilayeta Feqîh de ye û di encama meşandina siyasetên faşîstî yên xwe de dê rê ji bo guhartina rejîmê xweş bike.

Bi giştî ew alîgîriyê cur bi cur yên xelkê ji Ehmedînejad dikare di pêşerojekî nêzîk de bo dijatî tevî wî û derdora wî, tevlî dengê hêzên siyasî û azadîxwaz, tevgerên rewşenbîrî, jinan, xwandekaran û... bibe, bê guman eva dê çaxekê xurtir bibe ku hogirê dirûşmîn edaletxwazane û dijî fisad yên wî sar bibin.

Civaka Cîhanî:

Ji ber wê ku Îran welatekî stratejîk, dewlemend û xwedî çavkaniyêن aborî ye, lewra bo civaka cîhanî bi taybet Rojava, pûteyekî taybetî heye û guhartinê siyasi û siyasetên hikûmetî di wî welatî de bi sedemên binpêkirina mafêن mirovan, piştevanî kirin ji terorîzmê û xebat ji bo bîdestveanîna çekêن Etomî û ... bi tevahî li bin çawdêrî û zêrevaniya navneteweyî de ye. Ji ber wê ku komek Melayêن pawaxwaz û kevneperek bi têklkirina ol û hikûmetê û nasandina xwe wekî nûnerê Xwedê dixwazin raman û nêrînê kevn û tejî ji zulm û zorê ji rîyêن işkence, zîndan, zext û givaş, idam û ... bi ser xelkê de bisepînin.

Lê berevajî salêن borî, ne tenê rewşa hundirê welat, ji ber ku xebata navend û saziyêن mafêن mirovan, zirûfa navneteweyî û herwiha berxwedaniya xelkê jî iznê nade ku hikûmeta totalîtêr û kevneperek işkence, girtin, idam, binpêkirina maf û azadiyan, teror û hovîtiya salêن borî bidomîne. Zext û givaş anîna roj bi rojê berfirehtir û zêdetir ya civaka cîhanî bo ser rejîmê jî gewahyarê vê yekê ye.

Bi giştî guhartinek ku di rewşa niho ya Îranê de bi hilbijartina Ehmedînejad pêkhatiye, rewş û pêwendiyêن rejîmê roj bi roj zêdetir dike û domandina siyasetên berê, dê bi nerazîbûnen zêdetir berengar bike û Wilayeta Feqîh jî bi hilbijartina Ehmedînejad ji rîyêن zext, givaş, fêl û derew û hwd... pêwendiyêن navbera xwe û aliyêن din yên hikûmetê, xwe û xelkê Îranê û herwiha xwe û civaka cîhanî aloz û xirabtir kirîye û kakil û rûçikê rastîn û vala yê xwe jî li hember pêl û bahozêن bûyerêن pêşerojê de danaye.

Cejna 60 saliya avabûna Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê

Agirî



سال خەبات لە چىناو دازادى xebat ji bo Azadiyê

Di 25'ê Gelawêja îsal (sala 1384'ê Rojî) hemberî 16.08.2005'an de, Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê cejna 60 saliya avabûna xwe lidar dixe. 60 sal xebat û tekoşîna berdewam û bêrawestan ya xortê wan di rîya azadî, demokrasî û mafê neteweyî yên gelê Kurd, mafê serbilindî û serfiraziya PDK Îranê û civatêن xelkê Kurdistanê ye. 60 sal berdewamî li ser azadîxwazî û emegdarbûn bi armancê neteweyî yên gelê Kurd, 60 sal tekoşîn û xebat bo ji holê rakirina stema neteweyî û cîgirkirina buha û nirxêن demokratîk, pêşverû û nûjen, 60 sal hilgirtina ala berevanî kirin ji dadperwerî, wekhevî, maf û azadiyêن mirovî, ev jî di demekê de ku di tevahiya wî çaxî de diktatorî, zulm û zordestî bi ser welat de zal bûye, hêjayî vê çendê ye ku em pê serbilindî û serfiraziyê bikin. Alayek pîroz ku Pêşewa Qazî Mihemed û avakerên din yên PDK Îranê di 25'ê Gelawêja sala 1324(1945)'an de hilkirin û rêvingêن rîya azadî, aşî, demokrasî û mafê neteweyî heta niha bê rawestan didomînin.

Di vê rîya pîroz de bi hezaran xortê egîd û şoreşvan yên gelê Kurd li Kurdistana Îranê hatine şehîd kirin. Şehîden mezin wek Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Ebdulrehman Qasimlo û

Dr. Şerefkendî. Hejmareke zaf ji xortên gelê Kurd ji ber meşandina xebat û tekoşînê di refêن PDK Îranê, yan bi sedema piştgîrî û alîkarî tevî partiya xweştiyî ya xwe bi birîndarî, kêmendambûna cendekî(siqet), girtin, zîndan û dûrxîstîn û gelek pirsgirêkîn din re rû bi rû bûne.

PDK Îranê di rewşekê de ber bi dehsaleke nû ji xebat û tekoşînê gavan davêje ku bûyer û guhertin di Rojhilata Navîn û deverê de, bi qazancê berbişşedeqûna xebata azadîxwazane û tevgerên daxwazkar yên demokrasî, Federalîm û mafê mirovan pêşve dije. Rejîma kevneperek ya Îranê jî di refa yekem û pêşîn ya wan sisteman de ye ku li hundir û derive de zext û givaşeye zaf ji bo pêkanîna guhertinan li ser de ye. Partiya Demokrat bi yê derbasbûyiya pir serfirazî û şanaz ku heye, bi wê xweştevîbûn û hezlêkirina zaf di nav xelkê Kurdistanê de, bi ceribînen mezin û dewlemend ku kom kirine û bi hilgirtina dirûşmîn bîcî û hêja ji bo vî serdemî, bê guman dikare di destpêka dehsala heftan ya temenê xwe de, roleke mezin û bingehîn di jiyana siyasi ya gelê xwe û welatê xwe de hebe.

Kurtiyek ji jiyan û kesatiya Şehîd Dr. Qasimlo

Amadekar: Cefer Mehmûn

Ger mirov bixwaze li ser hemû warêni jiyan û kesayetiya rêberê zana û mezin yê gelê Kurd, Dr. Ebdulrehman Qasimlo bas bike û binivîse, divê gelek lêkolinan bike û di çend pirtükên mezin de wan cî bike. Lê em li wir dê bi kurtî basa jiyana wî kesatiyê cîhanî yê Kurd û herwiha kesatiya wî bikin.

Rêberê zana û mezin yê Kurdan Dr. Ebdulrehman Qasimlo di sala 1309(1930)'an, roja inê, dirêjtirîn şeva zivistanê(Şeva Yelda) ji malbateke Kurdperwer û welatparêz, li Gundê Qasimlo yê bajarê Urmiyê meskenê şêr û egîdan hate dinê.

Xwendina xwe ya destpêkî û navendî li bajarê Urmiyê bi dawî anî û ji bo berdewamkirin û domandina xwendina xwe çû bo bajarê Tehranê.

Şehîdê nemir Dr. Qasimlo xebata xwe ya siyasi bi avakirina Yekîtiya Ciwanê Demokrat ya Kurdistana Îranê di sala 1324(1945)'an li Urmiyê dest pê kir. Piştî hiloşına Komara Kurdistanê di sala 1946'an, ji bo domandina xwendinê çû Tehranê û di sala 1327(1946)'an, ji bo xwendina bilind çû bo Parîs, serbajarê Fransayê. Ji zarokatiyê de hesta azadîxwazî û welatparêziyê di wî de dihate dîtin. Bo nimûne: Di çaxê desthilatdariya Komara Kurdistanê de babê wî, Mihemed Axa tevî Zêro Begê Herkî, Reşîd Begê Herkî û çend kesayetiyen mezin yêndi Kurd ji bo çareser kirina Pirsgirêka Kurd çûn bo Yekîtiya Soviyeta berê. Paş çend rojan ew vegeryan Kurdistanê. Dr. Qasimlo wî demê 11 salî bû. Yekem pirs ku ji babê xwe kir, eva bû ku we ji bo gelê kurd ci Kir û ci anije?

Paşan derbareya 28'ê Gelawêja sala 1332(1953)'an mecbûr bû bi tevahî xwe veşêre û bi awayekî nepenî li Tehranê û Kurdistanê xebata siyasi û karê rôxistinî yê partiyê bike. Dr. Qasimlo piştî 5 salan xebat û çalakiya siyasi û neteweyî li Îranê xasma li Kurdistanê bo careke din çû bi Çekuslowakiya.

Sala 1341(1962)'an li Zanîngeha Piragê, Dukturaya Aboriyê wergirt û heta sala 1970'an di zanîngeha Piragê dersa Aboriya Sermayedarî, Aboriya Sosyalist û Aboriya Teorî digot.

Di Konferansa Sêyem ya PDK Îranê de ku di meha Cozardana 1350(1977)'an hate girtin, Dr. Qasimloyê nemir wekî endamê Komîteya Navendî û piştire jî wekî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê hate hilbijartin û di hemû kongireyên Partiyê de wekî Sekreterê Giştî dihate hilbijartin.

Ew 18 salan wekî rîberekî zana,

serokaniyeke mezin û dirokî ji bo nasandina doza Kurdistanê ye. Dr Qasimlo miroveke alim û zana bû. Di felsefe û wêjeyê de gelek têghiştî bû. Bi çend zimanê fermî yên cîhanê diaxivî. Dijminê gelê Kurd ew pêxemberê aştiyê û mamostayê demokrasiyê ji me standin. Ew yek ji mezintirîn şehîdên Kurdistanê ye. Bî û baweriya wî rewşenbîrê mezin azadî, aşti û demokrasî her gav di dilê gelê Kurd de dimînin û bi ronahiya wan tarîti ji nav diçe.

Aqibet roja
22.04.1368(13.07.1989)'an, di demekê de ku Dr. Qasimlo û 2



tekoşer û jêhatî di pileya yekem ya berpirsiyariyê de kar û xebata neteweyî û demokratik di nav refîn PDK Îranê de birêve bir.

Dr. Qasimlo hertim dijî şer bû, digot Komara İslâmî şer bi ser gelê Kurd û PDK Îranê de sepandiye. Wî bawerî bi çareseriya pirsgirêka Kurd ji rîya siyasi hebû. Lewre hertim digot ku pirsgirêka Kurd ji rîya leşkerî nahê çareser kirin, belki divêt ji rîya siyasi çareser bibe.

Dr. Kendal Nezan, Berpirsiyarê Enstitûya Kurdi li Parîsê li ser kesayetiya Dr. Qasimlo li Goristana Pirlaşêzê wiha dibêje: "Îro di dîroka gelê Kurd de rojekê girîng e. Bi rastî miroveke wekî Dr. Qasimlo kêm peyda bûne, ew akadâmisyleneke mezin bû"...

Pitûka wî **Kurdistan û Kurd**

hevalên wî, Ebdula Qadirî Azer, nûnerê PDK Îranê li derive û endamê Komîteya Navendî û Dr. Fazil Resûl Kurdê Iraqî yê dostê PDK Îranê ji bo çareserkirina pirsa Kurd Li Kurdistanâ Îranê ji rîya gotûbêj û aştîxwazane, tevî teroristên bi nav diplomat yên Komara İslâmî ya Îranê li Viyena Serbajarê Otrîşê hatine şehîd kirin. Bi Şehîdkirina rîberê mezin û tekoşer yê Kurd, gelê Kurd li Kurdistanâ Îranê careke din soz da ku heta bidestveanîna armancê pîroz û heq yê Dr. Qasimlo û hemû şehîdên rîya azadî û mafêñ neteweyî yên gelê Kurd dest ji xebatê bernadin.

Rêbaza pîroz û bîr û baweriyyen wî yên azadîxwazane, neteweyî û demokratik hertim di dilê neteweya me (Kurd) de dijîn.

Şehîd namirin.

Jin û aborî

Çinûr Qadîrî

Jin cuda ji vê çendê ku li kuderê dijin û ci rewş û berpirsiyarek hebin, dikevine ber êrîş û tund û tûjiyê. Jin di her rewşekê de ku dijin, nemaze di dema şer û pevcûnan de ji hemû aliyeke ve, bi êrîş, lêdan û azarên zayendî (cinsi) yên mîran re rûbi rû dibin. Hemû ev tund û tûjî dibine sebebê vê çendê ku li hember besdariya kemîl û berfireh ya jinan di civakê de, di kar û xebatêni siyasi, hilbijartinan, hebûna mafê welatîbûnê, mifah standin ji mafê perwerde û hînkirina xwe, pêşdebirina şîyan û karînê xwe wan û kemîlîna kesayetiya xwe asteng li pêşîya wan pêk bîhê, eva ji aliyeke hîsa bawerî bi xwebûnê di nava jinan de lawaz dike û ji aliyeke din ve jî nebûna **serxwebûna aborî ya jinan** ku awayekî din ji tund û tûjiyê ji jinan re tîne holê ku cendek û ruha jinê bo aliye dûrketin ji civakê û aqibet jî bo ji navcûnê dikişine. Çonkî mîr di warê aborî de jinan ji xwe re dikin kole û bindest. Lî heke jinê xwandina akademîk û zanîngehê û herwiha pisporî û şarezayıyek tune be, hetanî ku bikarîn bi alîkariya wan dahatek hebin û bi awayekê bikare li ser pêyê xwe bisekine, pitir ji aliye mîran ve mifah standina xirap ji wan tê wergirtin.

Di welatê Îranê de, jin nîvek ji nifûsa welat pêk tînin. Eva di halekî de ye ku li gorî serhijmariyê fermî, tenê 11 ji sedê (%11) ji hêza kar ya welatê Îranê jin pêk tînin.(1)

Li gorî zaniyariyê serhejmariya xebitîn û bêkariya malbatê li Îranê, di sala 1381 (2002)'an de, qasê xebata aborî ya jinan 11 ji sedê li hember 63 ji sedê ji hejmara berçav ya mîran e.(2)

Lewre hêza kar li Îranê di bingeh de mîrane ye. Civaka Îranê, civakeke paremayî ye û di çarçoveya welatê cîhana sîyem tê hesibandin. Berdewambûna çanda kevneşop ya îdarekirina



aboriya malbatan bi destê mîran û ji aliyeke din jî kosp û berbendêni li ser rîya kar ji bo jinan cihê şirovekirinê ye û divêt dahûrandineke kûr û berfireh li serbihê kirin. Ji bilî vana, pêvajoya hêza kar û xebata jinan di Îranê de bi sedemêni wekî radeya xwendina wan, pirsa zewicînê, qasê zarakan û qonaxêni jiyana jinan ve girêdayî ye. Bi awayekê ku qasê xebata aborî ya jinan xwedîyê xwendina bilind nêzîk 4 caran zêdetir ji jinê xwedîyê xwendina navîn û 13 caran pitir ji jinê xwande ye.(3) Bi vî avayî em dikarin bibêjin ku zewicîn û nemaze hebûna zarakan dibe sedemê dest ji kar kişandina pareke zaf ji jinan. Bi hêsanî xuya dibe ku xebata aborî ya jinê ne zewicî 2 caran pitir ji jinê zewicî ye.

Em dikarin bandora berpirsiyariyê malbatî, nemaze pêgiranî (avisbûn) û perwerdeya zarakan di kêmîbûna kar û xebatê aborî û civakî yên jinan di civaka Îranê de bi hêsanî bibînin. Berdewambûna dabeşkirina kar li ser bingeha zayend (cins)ê di nava malbatê, civakê û qanûnan de û nebîrina xebatê taybet bi xwedîkirina zarakan û kesen temendirêj ji bo navend û cihê heyî di civakê de, ne tenê sedemeke girîng di xwe parastina jinan bo çûn ji bo bazara kar e, belkî berpirsiyariya jinan ku dixebeitin, du caran pitir dike. Bi giştî sedemêni jor ji sebebê bingehîn yên derketina jinan ji ort û meydana kar tên hesibandin.

Di gelek ji welatê cîhanê de parêne wekî pişeya sivik, polîs, xebatê cîbicî kirinê û hwd... wek delîveyen kar ji bo jinan têne hesibandin, lê di Îranê de xebatê jorîn bi gelempere mîrane têne zanîn û nikarin ji hêza kar ya jinan mifahê werbigrin. Lewre ew jin û keçen ku ne xwedîyê xwendina akademîk û zanîngehê û nepisporiyê ne, ji bo bidestveanîna kareke bi dahat bi pirsgirêkîn zaf re rû bi rû ne. Bi sedema nebûna şarezayıya wan di teknîk û karê pisporane de piraniya wan jinêne ku kar dikin, di bin bandora bêparî, tund û tûjiya aborî û êrîşen zayendî de ne.

Keç û jinêne ciwan ku di salêne pêşîn de tevî dawîanîn bi xwendina zanîngehê û xwendina bilindtir, ji bo hebûna serxwebûna aborî tevî bazara kar dibin, ji aliyeke divêt ji bo şikandina nîrê zordar bi ser rewşa kar û xebata jinan di civakê de û herweha dijî qanûn û biryarêna paşverû û kevneperek yêne



Komara İslâmî ya Îranê xebat û tekoşînê bimeşînin û ji aliyeke din xebatê xwe di beşen Giştî û Taybetî de zêdetir bikin.

Eva kurtiyek bû ji rewşa aborî ya jinan di Îranê de. Jinêne Kurdistanê ji ber vê çendê ku yek jin in û du Kurd in, di hemû warêne jiyanê û nemaze di warê aborî de bi rewşekê gelek aloztir û nebastir re rû bi rû ne.

Jêderê gotarê:

1 û 2: Belavoka NAME, çapa tehranê, hejmar 30
3: Malpera jinêne Feministî yên Îranê, oktobera 2004

Serdestiya
 parek ji
 kevneşopî û
 ramanên şaş ku
 ji nezanî û
 neagahiyê tê,
 bûye sedem ku
 mirov nekaribe
 xwe bi rastiyê re
 rêk bixe, rastiyên
 ku zû yan direng
 dê cihê xwe
 bigrin û dê
 berheq bûna xwe
 biselimîn in. Lé di
 vê navberê de
 gelek kes hene
 ku li hember vê
 şopê dissekinin û
 dixwazin ku
 tekûzî û
 pêşdeçûyîna
 rastiyên mayînde

tevlîhev bikin.

Yek ji rastiyên berheq ku mandelenexwaz nahê încar kirin wekheviya di navbera jin û mîran di nîzama hebûnê de ye ku tim ji aliye mîran ve ketiye bin êrîşen dijwar yê mandele kirin. Ev ramanê kevnar û nepejirandina rastiyân, wisa kiriye ku jin di gelek biyavên civakî û bixasmanî biyavên siyasi de nekaribin bi gîrsî xwe nîşan bidin, bi awayekê ku em dibînin qadek ji civakê yan ji rîndtir em bibêjin nîviya civakê ji siyasetê dûr ketine û ew radestî mîran kirine.

Pirsa ku li vir xwe radixe berçavan, eva ye ku havirdora siyasetê bi giştî mîrane ye, ji ber wê ku bandora guhertinê civakî li ser diyardeya mîr serdestiyê de jar û lawaz e, lewre tevlîbûna jinan bi siyasetê re pir zehmettir dibe, bi awayekê ku mîr pişkdariya jinan di siyasetê de

Jin û siyaset

Meryem Hacîpûr



yan napejirînin, yan ji ger bipejirînin pûte û girîngiyê bi pişkdariya wê nadîn û ji aliye din ji bi rijdî dikevine ber êrîşen ruhî û pisîkolijîkî yê mîran, kesayetî û abîrûyê siyasi ya wan ji dibine bin pirsiyarê.

Ji aliye din ve civaka mîr serdest û ramanê kevneşop li ser jinan daye sepandin ku divêt bipejirînin ku şîyan û karîna wan nikare bersîva civak û siyasetê bide, tenê havirdora malê û karên girêdayî bi wê dikare ji bo jinan cihê xebat û tekoşînê be, jin ji bi neçarî vê ramana şaş dipejirînin û vê nîrînê dişopînin. Di vê derheqê de ji ya ku hê pêtir şansê hebûna jinan di siyasetê de berteng dike, parvekirina neadilane ya kar di malê de ye ku bi hegera nexş û rolên kevneşopî ku ji mîj dem e bi jinan re hatiye

tê dagîr kirin. Lewre ev çende di jinan de dibe sedema dilsarî û ne baweriya wan bi xwe û karên xwe.

Lê divêt ev çende bihê zanîn ku di cîhana hebûnê de, parvekirina nîrx û buhayan ne li ser bingeha zayendî ye, ji ber ku li ser bingeha hîmîn mirovahiyê ye û mafê her du zayandan(jin û mîr) e ku xwediye mafekî wekhev û hevpar bibin ji bo bandor danan li ser civak û bi xasma biyava siyasi ya civakê. Lé nahê încar kirin ku ji bo geşekirina û pêşketina civakê hewce ye ji tim hêzîn mirovî û her du zayandan mifah bihê wergirtin. Jin ji gereke li hember xwestikê xwe yê mirovî û berheq berxwe bidin û bi bê tirs bikevin nava biyava siyasi û vê rastiyê ji bidin selimandin ku bi bê hebûn û pişkdariya jinan di warê cur bi cur de pêşketina civakê ne mimkin e.

Jin du hemberî mîran bêkar in

İsna: Li gor rapora navenda serhejmâri ya İranê, hejmara jinê xwedî bawernameyên akademîk ku bêşol in du hemberî mîren xwedî bawernameyên akademîk e. Eva di halekê de ye ku salane 300 hezar kes qonaxa xwendina zanîngehê derbas dikin, lê bêşol dimînîn. Hêjayî gotinê ye ku hejmara bêşolên İranê zêdetir ji 10 Milyon kesan e.


Zewaca li ser neçariyê girîngtirîn pirsgirêka keçen Ciwanroyê

Civata Jinê İranê: Zewaca li ser neçariyê ya keçan li Ciwanroyê bûye sedema jêhelçûna serhejmîriya telaqê (ji hev veqetianê). Li gor gotina Foziye Kerîmî, rîveberê Civata Çandî û Civakî ya Jinê Ciwanroyê, zext û gîvaşen malbatî li ser jin û keçan, neagahiya jinan ji mafê xwe û herwiha zawaca bi zorî ya keçan di temenê kêm de bûye sedema jêhelçûna serhejmîriya Telaq û cudabûnê. Wê herwiha zêde kir û got: Pirsgirêka bingehîn ya jinê Ciwanroyê zewaca li ser neçariyê ye û ji ber ku ew zewacane di temenê kêm de diqewimin, pişti heyameke kêm dibe sedema şer û pirsgirêk û telaqê.

spartin û mîr ji
 xwe ji
 encamdana wan
 karan diparêzin û
 piraniya wan
 karan dikeve
 stûyê jinan.

Aliyê din yê vê
 pirsê eva ye ku
 mîran tim
 xwastine bîr, şert
 û nîrînê xwe li
 ser jinan bidin
 sepandin û bi wî
 karê xwe wisa
 kirine ku jin ji di
 warê bîrkirin û
 kiryarê de
 girêdayî ramanê
 mîran bin, bi vî
 awayî ji mafê
 wan yêñ fikirînê
 û qedera wan ji

Rêjîma Îranê du ciwanên nêrbaz daliqandin



Di 19ê vê mehê de, li bajarê Maşhad ê Iranî du ciwanên nêrbaz hatin daliqandin. Malpera "Iran Focus" di nûçeyeke xwe de dinivîsîne, ku yek ji herdu ciwanan 18 salî bû, yê dî 16 an 17 salî. Herdu ji ber têkiliyên cinsî bi kurekî 13 salî re hatin daliqandin. Rêxistinê mafêni mirovan ên Iranî dibêjin, ku ji dema destpêka Şoreşa İslâmî di sala 1979ê de, dora 4000 mîbaz û nêrbaz hatine daliqandin. Ji têkiliyên cinsî di navbera kesine nêr de nêrbazî tê gotin, û ji yên di navbera keç û jinan de mîbazî tê gotin.

www.amude.net

Gereke Îran îdama zarokan bisekinîne

Rêxistina Efûya Navneteweyî di rapora xwe de ku di roja 22.07.2005'an hate belav kirin, da xuya kirin ku divêt Iran îdama zarokan bisekinîne. Wekî tê zanîn hikûmeta Iranê di heyamê heftiyekê de 3 zarok ku jiyê wan di bin 18 saliyê de bûne, daliqandine.

Hêjayî gotinê ye Iran wekî endamekî Konvansiyona mafêni medenî û siyasi (ICCPR) û Konvansiyona Zarokan (CRC), pejirandiye ku kesê ku jiyê wan ji bin 18 saliyê de be, idam nake.

Hovîtiya rejîma Komara İslâmî li Shinoyê didome

Hêzên tepeserkar yên Rejîma Komara İslâmî di doma hovîtiya xwe seet 10'ê şeva sêsemî 4'ê Pûşperê (26.07.2005)'an êriş kirine ser malekê û jinek bi navê Cemîle kuştin. Herwiha kirêgirtiyê Komara İslâmî êriş birine ser ew dayikan ku bo haydar bûn ji rewşa zarokên xwe li hember girtîgeha bajar kom bibûn, bê hurmetî bi wan kirin û xistine ber lêdanê.

Xweşewitandina du keçan li Makûyê



Li bajarê Makûyê du keçen ciwan bi navên **Şehnaz İslâmî** keça Yûsif, rûnişvanê Gundê **Dêm** û **Zeyneb Armin** keça Mihemed Merûf, rûnişvanê Gundê **Koçkakî** xwe şewitandin. Sedema xweşevitandina wan du keçane vedigere ser hakimbûna desthilata mîr serdestî di malbatêwan de, zext û givaşen malbatî û herwiha neçarkirina bi zewicîna bi zorî.

Li Sine gireva nerazîbûnê

Roja şemî 30.07.2005'an endamên saziyên ne dewletî û çalak û xebatkarên medenî yên Parêzgeha Kurdistanê li Sine li hmeber Parêzgeha Kurdistanê gireva nerazîbûnê li darxistin. Armanc ji girvagirtina Kurdan li bajarê Sine **binpêkirina mafêni Kurdan di encama bûyerên herêmên Kurdan** hate ilan kirin.



Beşdarên gireva nerazîbûnê bi lêdana gespan devê xwe girê dan.

Girevgirtiyan bi derkirina biryarnameyeke 4 madeyi, daxwaza pêkanîna dodgeheke aşkira ji bo kesen encamder û fermanderên kuştina Siwane Qadirî, welatiyê kuştî yê Kurd li Mehabadê û azadî û serbestberdana girtiyen bûyerên vê dawiyê yên herêmên Kurdan.

Gefa Kevirbaran kirin ji Nazî Ezîzî



Helbestvan û stranbêja Kurd a xelkê Mahabadê **Nazî Ezîzî** ragehand ku ew ji aliyê Îtilata Iranê (Dezgeha Sixori û Casusiyê) hate girtin û lêpirsin lê hatiye kirin.

Di lêpirsinê de bi wê hatiye gotin ku êdî mafê xwendinê nine û heke kiryar û xebatêna xwe dubare bike dê bihê kevirbaran kirin.

Hêjayî gotinê ye ku straneke wê bi navê **Mirina gula sor** çend caran ji Kurdistan Tv yê hatiye bilav kirin.

Dîsan jinek hate kuştin

Jinek bi destê mîrê xwe bi guneha xwe revandin tevi xortekê ku di pêş zewicînê de evîndarê wê bûye, hate kuştin. Ev jine ku xelkê gundê Resûlavaya Mehabadê ye bi zora malbata xwe hatibû zewicandin. Ev jine çendin caran ji mala mîrê xwe hilatibû û pena bo mala bavê xwe biribû, lê hemû carê bo mala mîrê xwe hatibû şandin. Di encam de ew jine tevi kurekê xwe dide revandin, lê mîr û bavê wê bi fêlan tînine malê û dikujin.

Ragihandina Nûjen û çend gotinek

Emîr Şuaîvend

Rojane li her aliyê cîhanê bi dehan bûyerên cur bi cur derdikevin rojevê, hinek li asîman diqewimin, hinek ji binê deryayan û hinek jî li ser rûyê erdê. Cihê rûdana hinan nêzîk û cihê hinan jî pir dûr in, lê em çend deqîqe piştî rûdana wan dikarin wan bibînin yan jî nûçeya wan guhdarî bikin. Gelek caran çê dibe ku deng û rengê bûyerekê ku li welatekî gelek dûr qewimiye, zûtir ji bûyerekê ku li gund yan bajarê ku mirov tê de dijî, digihîje mirov.

Ev hemû bi saya ragehandinê ye. Ragehandinek ku iro tu sinûrekê nas nake. Bi awayekê ku êdî mirov dikare bîbêje **Gilobalîze** bûye. Ev jî gişt bi saya teknolojiya nûjen ya îroyîn e.

Dema ku em dibêjin ragihandin bêsinûr û Gilobalîze bûye, ev ne zêde gotin e. Ji ber ku em rojane bi hêsanî vê çendê dibînin û hîs dîkin, ragihandin û xizmetên wê êdî bûye pêwîstî û parekî girîng ya jiyana mirovahîyê. Dema ku em jiyana xwe ya iro û ya 10- 15 salan berî niha raxin

berçavan, em dibînin ku guhertinê pir mezin di jiyana me ya îroyîn de pêk hatine. Bi liberçav girtina ragihandinê di wan guhertinan de, em dibînin ku piraniya herî zor ya wan guhertinan bi saya ragehandinê pêk hatine.

Bo mînak, berê dema me bixwasta lêkolînekê li ser dîrok, wêje yan jî aliyên din yên zanistê pêk bînin, gerek bû sermayeyekî baş û demekî zor di xizmeta me de hebûya. Me gelek pirtûkxane û arşîvxaneyên cur bi cur bisopanda û seredana gelek lêzan û lêkolînerên dûr û nêzîk bikira, lê iro bi saya ragihandinê rewş bi giştî hatiye guhertin. Êdî ji bo agehdarî wergirtin, fîrbûn, lêkolîn û hwd... pirsa dema zor û pareyê stûr hatiye çareser kirin. Iro torekî wisa ya ragihandinê li ser bingeha agehdariyê hatiye ava kirin ku mirov dikare li mala xwe li hember Kompûtera xwe birûnê û bi hemû zanîngeh, pirtûkxane, arşîvxane, hikûmet, lêkolîner, zana û hunermendêن cur bi cur re peywendiyê bigre. Mirov dikare di dema çend deqîqeyan de li welatê ku tê de dijî xwe bigihîne welatekî din û têkeve nava navendên navdar û girîng yên agehdariyê. Ger ew der bi dilê mirov nebe, mirov dikare her di vê demê de here welatekî din û di navendên wan de zaniyariyênu ku ji bo karê xwe pêwîst e, werbigre û di Komputera xwe de biparêze. Ger mirov daxwaz, xwastek yan jî pêşniyarek hebe, dikare raberî wan bike û piştî çend deqîqeyan bersiva xwe werbigre. Ji bo wergirtina agehdariyê rojane mirov dikare bi rêya Internetê di demekî kin de rojnameyên welatekê, bo mînak yên Îranê bisopîne, piştire ji yên Îngilistanê binhîre û piştire jî yên Amerîka û hwd...


Ev teknolojiya îroyîn ya ragihandinê gelek kar û barêñ din yên jiyana mirovan sivik û rihet kirine. Posteya Elekteronîk yek jî xizmetguzariyê girîng yên vê teknolojiyê ye, ji bo ku mirov ji rewşa hevalekî xwe haydar be yan jî peywendî bi rewşenbîr, parlementar û hunermendekî welatekî

din bigre, êdî gerek nine mesaja xwe li ser kaxezê binivise û bişîne idareya postê û heyamekî zor li benda bersivê bimîne, belkî dikare bi rêya Posteya Elekteronîk di çend deqîqeyan de mesaja xwe bişîne û piştî çend deqîqe yan çend seetêñ din bersîva xwe bistîne. Herweha di Internêtê de mirov dikare têkeve nava odayêñ cur be cur yên nîqaşê ku li wir girûpêñ cur bi cur her yek li ser pirsekî taybet bi hev re danûstandinê dîkin ku her yek ji wan jî li kuncikekî cîhanê ye. Mirov dikare li wir bibe mîvandar û bi xwe konferansekê saz bike û li seranserê cîhanê ve mîvanan li konferansa xwe de bicivêne.

Di ragihandinê de ji bo çareser kirina pirsa **dem, cih û navberê** pêşketinêñ gelek hêja hatine rojevê ku ji bo gelek kesen dûr ji vê teknolojiyê ev çend nayê bawer kirin. Bo mînak, li Amerîka xwendingeñ dicîtalî hatine ava kirin ku her yek ji xwendekarêñ xwedî ev teknolojiya taybet li seranserê cîhanê dikarin di wan xwendingeñ de navnivîsinê bikin, ango her xwendekarekî vê xwendingeña taybet dikare di mala xwe de serê seeta diharî kirî bikewe nava kilasa dersê û mamosneyê xwe bibîne û dengê wî guhdarî bike, pîrsan jê bike û bi xwendekarêñ din re nîqaşê bike. Niha zarokêñ gişt balyozêñ Amerîka ku li welatêñ cur bi cur de dijîn, bi taybeti ji vê teknolojiya pêşketî mifahê werdigrin.

Gelo me Kurdan heya ci qasekê kariye tevî ev karwanê teknolojiya nûjen xwe rêk bixin?

Em Kurd xwedîyê 5 Televîzyonê Kurdî ne ku 2 heb ji wan temam dem û 3 jî dem dihar in. Li ser tora Internetê bi sedan malperêñ me yên siyasi, çandî, civakî û zanistî hene. Ev pêşkevtinê han cihê dilxweşî yên ne, lê li gorî serdemê ku em tê de dijîn û derfetêñ ku li ber destê me hene, em hêj di qonaxeñ kilasîk de dijîn. Herçiqas li gorî gelek neteweyêñ xwedî dewlet û naskirî, em li pêş de ne, lê nabe em qenaetê bi vê çendê bînin, ji ber ku di vî warî de dewlet bûn ne gelekî girîng e, çawa ku em dibînin ev teknolojiya ku di destê neteweyêñ din de ye, wisa jî ger em bixwazin, dikare bikeve destê me û tu kesek di vê rê de nikare ji me re bibe kosp û asteng.



Roman û Ewropa

Milan Kondera

Wergeran ji Farsî: Emîr Şuaîvend

(Beşa 1)



Edmond Hoserl di sala 1935'an ango 3 sal berî mirina xwe li bajarêن Viyen û Piragê axavtinên xwe yên navdêr, yên li ser kirîza mirovwxaziya Ewropayê pêşkeş kir. Ji bo Hoserl Ewropa tenê peyvekî cuxrafiyayî nebû (herçiqas Amerîka jî di xwe de digirt). Armanca wî pêtir zatekî nedîyar(menewî) bû ku ji kevneşopiya Yûnana kevin serî hildida. Li wir bû ku mirov bo cara yekem ji cîhanê weke pirsekê nihêrî û ev yek hêjayî bersivandinê dît. Yûnaniyan ji ber bi cî hatina hindek xwestikên xwe yên piratîkî cîhan nexistin bin pirsîyarê; sedema hatine rojeva pirsîyarê eva bû ku hezkirina nasînê di mirovan de heya qasekê zal bibû.

Kirîza ku Hoserl jê diaxivî bi bawera wî bi qasekî kûr û girîng bû ku ew ji vê çendê mereqdar dikir ku neke Rojava di hember wê de şiyana berxwedaniyê nebe. Li gorî wî rehêن vê kirîzê vedigere bo destpêka serdemê nû; bo Galîle û Dekart, bo nihêrîna yek aliyanê ya zanista Ewropayî ku cîhan weke alavekê di xwendinê ezmûnî û riyaziyatê(metmetîk) de biçük dikir ku bi vî rengî cîhanê zindiyê dihar bîrve dikir.

Serhildana zanistê berê mirovan da tonelên merîfeta pirofeşnal. Bi her gavekê ku merîfeta pirofeşnal hil digirt, mirov xwe û cîhan wekî gişiyetek bi ronakaiyek kêmter didit ku her roj di kûrahiyekê de dilivî, ku Haydgirê şagirdê Hoserl ev yek bi peyvekî xweşik û hêja ango **bîrvekirina hebûnê** binav kiriye.

Dekart mirov hîn kirin ku **Erbab û xwediyê xwezayê** bin ku bi wî rengî mirov weke alavekî sade di hember teknoloji, siyaset û dîrokê de hê biçuktir dibû, ango ev hêzên han ne tenê xwediyê têgihîstin û desthilatekî zaftir ji yê mirovan bûn, bigre desthelata mirovan jî di dest girtibûn. Ji bo ev hêzên han, hebûna berbiçav ya mirovan, ango cîhana wî ya zindî xwediyê tu nirxekê nebû. Bi wî rengî ev **cîhana zindî** di sîberekê de winda bû.

2: Nihêrînên rexnegirane ji serdemên nû ew ramana Soljnitsîn tîne bira mirov ku dibêje kirîza Ewropa bi serdemê

Rênesans ve dest pê bû û piştre dîrok tiştek nebû ji xincî pêvajoya ji nav cûnê.

Baweriya min ne eve ku her du diyardenasên mazin ku min pêştir navê wan anî, serdemê nûjen mandele kirine. Çêtir eva ye ku em bibêjin wan **ne roniya** wî serdemî ku wekî her diyardeyekî din ya mirovî, di dema zayînê de ku toyê zayne bi xwe re dianî ji nav birin. Ev ne roniya han bi tu rengekê nirxa çanda Ewropa ya çarsed sal berî niha kêm nake. Dilê min bi vî serdemî re pir geş e, ne ji ber ku ez Feylesofekî romannivîs im. Li gorî min Servantes bi qasî Dekart avakerê serdemê nû ye.

Ger em vê çendê bipejirînin ku zanist û felsefeyê, hebûna mirovan bîrve kirine, wî çaxî bi faktor ve em dikarin bibêjin ku Servantes hunerekî mezin ya Ewropayî afirand ku armanca wê hunerê tiştek ji xincî tim geriyan ji hebûna bîrveçûyî ji aliye zanistê ve nine.

Ger ku em hebûn û demê vekin, dê bibînîn ku gişt mayeyên êğzîstanêsiyalîstî ku Haydger mijûlî xwendin û danekefşa wan bû, di heyamê çar qern(sedsal)an dîroka romannivîsiyê de hatine xwendin. Romanê aliyeen cur bi cur yên hebûnê yek bi yek dan eyanê: Bi **Servantes** û hevçerxên wî re mijûlî xwendina pirs kişfinê_bû; bi **Riçardson** re karê lihevdana **eva ku di hundir de diqewime** dest pê kir; û rûcik ji ser jiyanâ dilovanî re rakir; bi **Balzak** re ev rastiye derxist ku mirov reh di dîrokê de heye; bi **Flobîr** re bû bi rêvîngê warê nenaskirî yê jiyanâ rojane; bi **Tulstoy** re rolê tuxmê ne eqlanî di rewîşt û biryar dana mirovî de raxist. Dem pêva, bi **Prost** re herikîna rabîhorî û bi **Joïs** re herikîna dema niha nasî. Bi **Tomas man** re rolê ustoreyên kevnar yên mirovan di rewîşta me de lihev da û gelek xwendin û serkevtinê din di vî warî de bi encam gehand.

Ji destpêka serdemê nû ve roman bi bê tu tirsekê ketiye pey mirovan. Her di vê demê de **meyla nasînê** ku Hoserl wê bi cohera nedîyar ya Ewropa dizane, bi ser romanê de zal bû û ev neçar kir ku hebûna dîhar ya mirovan bi baldarî têxe bin xwendinê û mirovan li hember xetera **bîrve kirina hebûnê** biparêze. Di vê wateyê de ez bi gotinekê ku Herman Birox tim û bi baldarî ev dubar dikir re me ku tenê sedema hebûna romanê danekefşa wan tiştanê ku tenê roman dikare wan kifş bike. Romanek ku parek nenaskirî ji hebûnê nede kifşê, romanekî ne exlaqî ye. Tenê hikmeta rewîşta romanê, nasîn e. Herwiha em bibêjin ku roman afiriya Ewropa ye. Afirînên romanê, bigre yên ku bi zimanê din in, bi tewahî ser bi vê sedsalê ne. Divêt doma afirînên romanê tim ser bi dîroka romana Ewropabihê zanîn. Tenê di vê çarçoveyê de mirov dikare nirxa berhemekê (ango girîngiya afirînên wê) bi tewahî bibîne û hîs bike.

Wî ez ji bîra kirime. Ew qet nema li hêla min dinere. Xwezi min bi gebeheta xwe jî zanîbûya. Wî berê herroj li min dixist. Roj tune bû ku bê lêxistin di ser min re derbas bibûya. Ez nizanim bê ci ji vî mîriki re hat. De we yê bidîtaya, gava wî li min dixist, bê ew çawa di ser xwe re diçû... Ew mest dibû û car hebûn ku ew bi cizbê diket. Di destêni wî de ez di arê emanê de bûm. Çavêni wî ji min pê ve tu kes nedidîtin. Lî niha, ew nema poz bi min dike. Wî ji xwe re hin meşqeleyên dinê pêde kirine. Heger ne weha bûya wî qet dev ji min bernedida.

De bê min û wî ci qasî li hev dikir. Em ci qasî li hev dihatin. Ez di hêmbêza wî de dibûm nola zarokeke deleli; ez dibûm mîna nixuriya ber dilê dêubavê, ez dibûm hezkiriyek ji rengê Zînê, ez dibûm sebra dilan û ew; ew jî dibû nola rebekî... Rebê ku bixwaze ji qûlêni xwe yên gunehkar heyfê hilîne. Ew gah bi min şad dibû û gah bi bergerandin ahenga dengen bedena min serast dikir. Wî gah melodiya ruhanî ji dil û gurçikên min, ji hinavêni min, ji ber rahnêni min derdixistin û gah hêc dibû û bi gurpîni dikişya ser serê min.

Wî bi seetan li min dixist...

Ez qet ji lêxistina wî aciz nedibûm. Qet ne xema min bû; tew kêfa min dihat. Ez di nav wan dest û pêçiyen wî de dibûm mîna milayketan; ez di ser ewran re diçûm. Ez bi wê hesûdiya ku alemê ji min û wî dikir, kêfxweş dibûm. Min li ba xwe digot, "Hela bê hin kes nateqin!".

Wî ji min hez dikir...

Gava ew li bin dara zeytûnê dixirpişî ser serê min, hemû qızikan di taldeya çavîyan de li me temaşe dikir. Wî ew nedidîtin, lî çavêni min her li wan bûn. Kizîni ji kezeba wan dihat; wan dev li dilê xwe dikir. Wan hertim xweziya xwe bi dilê min dianî ku ji dêvla min di hêmbêza wî de bûyina û ew jî ji dêvla min bixirpişya ser serê wan; li wan bixistaya. Her carake ku wî serê xwe bilind dikir û temberîka xwe hildida, hemû qızikan serê xwe bi şûn de dikişandin.

Ya herî pir min jê tahm distend û

Dela

Enwer Karahan

ez pê dipesinîm ew bû ku wî li pêş xelkê ya jî di orta dîlanê de li min dixist. Lî kêfa wî qet ji vî awayî re nedihat.

De gava wî weha dikir, min jî heta ku Xwedê qawet dabû min dikir qêrinî. Min bi aheng dikir gazî. We yê bidîtaya bê wan hustuşikeşiyen keç û xortan çawa bi çarpîne diçûnê; ji wan hebû ku ew wê erdê, wê axpînkek biqelêşin; ew zenzeleyê çê bikin; ew min û xwe tev de di bin wê erdê xin. Xwêdanê di nav piştên wan re diavêt. Ew bi pozikên qondereyan heta bi ber sînga Delalê min dihatin û gava wî serê xwe ji ser min radikir û bî awireke tûj li wan tifalan dinerî, hundirê wan diqetiya; wan bi şûn de baz dida. Kêfa wî ji tifalan re nedihat. Bi zora wî diçû ku di dawetan de li min dixe. Wî nedixwest ku li pêş xelkê li min bixe. Kêfa wî ji wê yekê re dihat ku ez û ew tenê li Qulika Gurân rûnin û ew berê xwe bide beriyê.

Wî pişta xwe dida beroşkekî perê Çiyayê Mazî û berê xwe dida valahiya deşte. Wî bi nazdarî li min dixist, li ber min digeriya; xwe davêt dest û lingên min, diricifi. Digiriya. Hêşirên wî bi ser hînarîkên rûyê min de dihatin xwarê.

Min jî li hemberî wî qet serhişkî nedikir. Min qet dengekî şas dernedixist. Min bi guliyen xwe rondikên wî paqij dikirin. Min qet nedixwest ku ew mitesîr bibe. Ez pê re dinaliyam.

De wî Xwedêyo!

De sibeh e û mala Delalî dike ji vira bar bike, ji vira here

De wî Xwedêyo!

Ez ê nizanim ci bidim cewaba Delalî malê ye

Ez ê qêmişî Delalê xwe nakim ku nifirekî lê bikim

Xwezi lingê lokê Delalê mala bavê min bişkê

Ew li min vegere, ji vira nere...

Di wê gavê de ku rêwiyeck ya jî nêcirvanek bi ser me de bihataya û silava Xwedê lê bikiraya, wî di cih de qut dikir. Te ew bikuştaya jî wî nema kilamek jî digot. Ji xwe ji tu kesî re nedistira. Ji min pê ve tu kesî dengê wî nedibihîst.

Heger pir israr bihata kirin, wî bi min dida gotin:

- Min ê Delalê malê bi destpaxilan û ramûsanen daxistiye jêr e

Min ê pişta Delalî daye Kulînê û berê wî daye cimeetê

Wê wextê Delalî malê dipêça mîrata cixareyê

Wî ji min dixwestî arê yêr e

Ez ê digeriym, min ê nedidît maş i yêr e

Min ê bi tiliyên xwe yên zer û zeytûni radihişti arê yêr e

Min ê dida ber cixareya Delâl e De wî Xwedêyo, wê gavê dohnêni tiliyan dinuqtî ser şerwerê Delâl e

Ez ê nediketim ber heyra dohnêni tiliyan

Ez ê diketim ber heyra şerwerê Delâl e.

Wî ez dikirim hêmbêza xwe û bi min re radiket.

Di demêni pêşî de wî ez dikirim nav hejikan. Ez di xaniyê malê de vedişartim. Wî newêribû min nîşanî kesî bide. Wî bi dizîka li min dixist û li ber min digeriya ku ez dengê xwe zêde dernexim. Bavê wî geleki ji min aciz dibû. Wî li kê derê ez bidîtama wî dê ez bişikenandama. Ji bavê wî hebû ku ji mitriban pê ve kes nikarin li min bixin. Wî nedixwest ku xelk ji wî re bibêjin ku kurê wî bûye mitrib...

Delalê min pê nedihat ser ku bavê wî zerarekê bide min, loma jî ez di quj û qewêran de diparastim.

Le niha? Niha ez li vê rasta Xwedê, di qilifê xwe de me. Li ser serê min tije toz e. Rojê deh caran di ber min re dihere û tê, li hêla min jî nanêre. Hema toza ku bi ser serê min ketiye jî paqij nake. Têlên dilê min hemû qetiyane. Nema deng ji min tê, mîna ku wî hebênen xewê dabin min û ew nexwaze ez careke din ji vê xewa miriyan şiyar bibim.

Wî ji xwe re meşqeleyen din pêde kirine... →

Hema ew çavêن xwe ji xewê biqelêse, ew rasterast berê xwe dide odayeke dinê. Xwezi wî ez li odaya xwe ji nehiştama; ez bavêtama ser sergoyekî, belkî xwedîxerekî ez ji xwe re vehewandima... Ew dihere li ber wê orosipiya kompîturê rûdine û ji sibehê hetanî êvarê bi wê şad dibe. Hema ew dike teqetûq û ji ser wê ranabe. Wextî bi wê qoltixê ve bizeliqe, li ser wê qaçikî bibe.

Ew dengê teqeteqê min dîhn dike. Bê wî çawa dev ji vî deng û awazê min ê ji dengê kewên gozel e berdaye û dihere bi wî dengê teneqeyî re mijûl dibe, ez fahm nakim. Ez fehm nakim bê min ci bi wî kiriye. Erê hema mirov ew qasî ji bêbext dibe? Hema ji mehê carekê be jî qey ew nikare min ji qilifê min derxe û akordekê bide min. Ma qey ew nikare bi qasî du meqaman li min bixwe?

Çi kir vî welatî li min weha kir...

Piştî ku ez ji cîwarê min dam anîn û pê ve, li wî weha hat. Heger wî ez neanîmaya van welatên xerîbiyê, ew ê hertim çavên min li rîya wî bûyana û ez ê her di wê hêviyê de bûmaya ku ew ê rojekê dîsa vegeiyaya û wî dê dîsa ez bibirama ber Qulika Quran û ew ê bikîşiyaya ser serê min... Lî derew e! Çû. Ew nema li min vedigere û bi wê orosipiyê re mahra xwe biriye. Ez di vê quncikê de hustuxwar û belengaz li hêviya wî me ku ew desten xwe li min dîne. Ez yekcarinan diqehirim û newêrim nifirekê lê bikim, ji ber ku nifirê min hertim diqewlimin...

De hema devê min nagere ku ez ji Delalê mala bavê xwe re tiştekî bêjim; Ya Rebîm, tu wî li ser wê kompîturorosipiyê hişk bikî; wî li wira bikî peyker!

PIRTÜKEKÎ GIRÎNG KETE PITÜKXANEYA KURDÎ

Pirtûka Pêkhate û Raveya Deq, pirtûkek e ku bi qelemê Babek Ehmedî bi zimanê Farsî hatiye nivîsandin. Ev pirtûka han li Îranê li ser daxwaziya Zanîngeh û daxwazmendênen wê 7 caran hatiye çap kirin. Heyamekê berî niha mamostayê wêjeya Kurdî, birêz Mesûd Babayî Pêkhate û Raveya Deq wergerande ser zimanê Kurdî û niha li ber destê xwendevanênen xwe de ye.

Naveroka vê Pirtûkê bas ji deqênen Felsefi, Hunerî, Wêjeyî, Olî û hwd... dike. Lîkolînen vê Pirtûkê deqênen kilasîk, dînî, modern û Postmodern di xwe de cih girtine. Ev pirtûke dikare di zanîngehan de weke serçaveyekî baş bihê bikaranîn. Herwiha Şanokar û hunermend ji dikarin li çend pişkîn vê pirtûkê bi taybet di warê sînema, sêwekarî û muzîkê de mifahekî baş werbigrin.

Me di derfetekê de seba derçûna vê pirtûkê çend pirs râberî birêz Babayî kirin ku wî wisân pirsên me bersivand:

Agirî: Birêz Babayî we pêwîstiya wergerandina vê pirtûkê di ci de dît?

Babayî: Pêkhate û Raveya Dêqê pirtûkek e ku dikare valahiyeke teorîk tejî bike. Hewcehiya wergerandina vê pirtûkê bo ser zimanê Kurdî vedigere bo ser vê çendê ku wêje û teoriya wêjeyî û Felsefeya hevçerx di nava rewşenbîriya me de tune ye, lewre ev pirtûke dikare rînîşanderekî baş be ji bo kesen ku di vî warî de dixebeitin. Herweha gereke ew helbestvan û nivîskarîn nûpa yê ku taze dikevin nava cîhana nivîsinê, şarezayıya

dikarim bibêjim diplom bo jorê heta lîsansê û hwd...

Agirî:
Pirsgirêkên ser rîya te di wergerandina vê pirtûkê de ci bûn?

Babayî: Pirsekî di cihî xwe de ye. Di wergeranê de pirsgirêk tim hene, lê pêka mijarê cuda hene. Wergerandina felsefeyê ne karekî hêsan e. Yek ji wan kospan pirsgirêka zarave û peyvîn Felsefi ne ku wergêr mandî



(peyvsazî) wî zimanî baş bizanibe, piştre mirov dikeve pey hîmê peyvî û tiraşîna wê. Lî min di vê pirtûkê heyâ ji destê min hatiye xwe ji tiraşîna peyvan dûr xistiye. Min pêtir xwestiye bikevim pey diyalekt û zar û şewazîn Kurdî da ku zaraveyan derxim holê, bi xweşî ve zimanê me dewlemed e û ez pêşerojekî ges li benda zimanê Kurdî de dibînim.

Agirî:
Pirojeya te di pêşerojê de ciye?

Babayî: Pirojeya min ya pêşerojê wergerandina berga (cild) sêyem û çarem ya vê pirtûkê ye. Berga sêyem dê li pêşerojekî nêzîk de ji çapê derbas bibe. Berga çarem ji hêj di bin wergeranê de ye. Ez bawerim dê li Payîza îsal de karê wê ji biqete.

بەشەنەوە رانەی دەھ

بابەک نەحمدەنی

كتىيە

وەسەرەدە بابەک نە

مەندىز



wan li ser rîbaz û şewazîn wêjeyî û Felsefi yêne Deqê hebe. Pêkhate û Raveya Dêqê ji bo biyavênen han hatiye terxan kirin.

Agirî:
Xwendevanênen vê pirtûkê ci qatek in?

Babayî: Xwendevanênen vê pirtûkê divêt di warê xwendebûnê de pileyekî baş ya zanistî û kilasîk derbas kiribin. Ez

ÇIMA PAYIZ

Rêbwarê birindar- Urmiye

winda
kiribû rê
pir.....
bi êş û jan bû
lê...
di şermê dea bû ne di
nali
bi.....
hêviya ronahiyê
hatibû der
li rojê digeriya
winda.....
kiribû rê
behêvi bû ji rojê
nexwes û perisan
bê guman bû li
ronahiyê
xuya bû
pir ji dil de têhnî ye
têhniyê ..
camek ave
ji destê dilberê
ku.....
ji dil de vejine jivanê
sotibû
dil
dûr ketibû ji rê
winda
kiribû dilber
li ..
ser lêva nalîn
jêr ziman de

xweziya payizê dixwest
lê.....
min jê fêm nekir
cîma payiz?
ketibûm erm ê
çawa bipirsim lê
rûyekî reş yek ji sîpi
çome pêş û min lê pirsî
bilind kîr ser
kûr ji dil de
pir bi axin
got:

bila bîhêtin payiz
payiza tol estin
dê

bistîne heyfê
heyfa bilbile
bilbila birindar
ji

pelgên gula sor
bila.....
bîhêtin payiz
dê.....
werine pelgên sor û zer
êñ.....
xwe hejin ên
derewin û dil xapînok


da ku ...
bihete der

roj
derkeve rastî û ronahi

Bersîva hejmar 20.


	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	e	r	d	o		n	û	b	a	
2	m	a	u	a	p		z	a	m	
3	(a)	z	a	i	a	(a)		z	ê	
4	n		a	l	e	k	o	k		z
5		(e)	l	i		w	e	r		
6		I	a	k		i	t	a		
7	b		x	a	i	a	n	e		(n)
8	ê	s		r	ê	v	(a)	(h)	a	
9	v	i	r	j	i		b	o	z	
10	a	r	e	s		m	a	z	i	

Peyva veşarti



XACEPIRS

A: Emîr Şüatwend



Peyva veşarti

1 2 3 4 5 6 7

Asoyî

- 1: Saziyekî Kurdi ku endamê rôxistinekî cîhanî ye
- 2: Hozekî navdar yê Kurd li Şarezûrê – Ji sûçekî xweş bûn
- 3: Xelkê Îlamê – Nivîsandina dequekê
- 4: Amêrek ba lêdanê – Karîkatorîstekî navdar yê Kurd
- 5: Xwarineke avikî ye
- 6: Cot nine
- 7: Bermal – Hingivîn bi Farsî
- 8: Turombêl – Lîstikekî Kurdi
- 9: Gurêl – Dîl
- 10: Stranekî folkolor – Ref. bi Soranî

Stûnî

- 1: Nefes – Zehmet
- 2: Cilê hespan – Çol
- 3: Pereyekî kevnar yê Îranî – Nirx
- 4: Di kevneşopiya Kurdan de bi şerefê re tê – Di Farsî de rêvîng
- 5: Di giryanê de çê dibe - Di Soranî de "nebêje"
- 6:
- 7: Hêvî – Xem
- 8: Herîfi – Bingehîn
- 9: Dayîk – Paqij
- 10: Saziya cîhanî ya xwardemeniyê - Xwar



Rojnameyeke mehane ya siyasi û çandî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

<http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci.php>

Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 -FRANCE
E - Mail:
rojnama_agiri@yahoo.com
agiri2003@hotmail.com



Cejna 60'mîn salvegera avabûna Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê li Finlandê tê pîroz kirin

**Şêst sal xebata bêrawestan, şêst sal
berxwedaniya bê eman di rêya
bidestveanîna mafênet neteweyî yên gelê
Kurd Pîroz be**

25'ê Gelawêja îsal temenê xebat û tekoşîna siyasi û neteweyî ya PDK Îranê dibe 60 salî. Bi vê hincetê Komîteya Finlandê ya PDK Îranê ji bo roja 13.08.2005'an cejneke mezin û berfireh bi besdariya hunermendê mezin û navdar yê Kurd **ŞIVAN PERWER** û **KARDO ŞEXO** li dar dixe.

Agahiyên pêtir derheq cejna 60'mîna Salvegera PDK Îranê li Finlandê li ser wêneyê jêrîn.

Li Washington Amerîka xwenîşandanek derheq piştevanî ji xelkê serhildayî li Mehabadê



Ji bo xuyakirina piştevanî û pişgîrîkirin ji meş û xwenîşandanen bajarê Mehabadê û her wiha hişyarkirina bir û raya giştî ya cîhanê ji cinayetên vê dawiyê yên rejîma Komara İslâmî ya Îranê li Kurdistanê, demjimêr 9'ê Sibêdeya roja duşemî 20.07.2005'an bi besdariya sedan kes ji endam û aligirê PDK Îranê û Rêxistinê Îranî û Kurdistanî li hember Koşka Sipî ya Amerîkayê li bajarê Washingtonê xwenîşandanek hate li darxistin. Kwepêşandan 2 demjimêrna dom kir.

Di heyamê xwenîşandanê de ev dirûşmîn jêrîn dihatin xwendin: **Bihiloşe rejîma terorîstperwer ya Melayan, Demokrasî ji bo Îranê, Edalet ji bo Kurdistanê, Federalizm û azadî ji bo Kurdistanê.** Piştre besdareñ xwenîşandanê xwe gihîjandin hember Kongrêsa Amerîkayê û xwenîşandan nîv seet li wir dom kir.

Di dawiyê de çend gotar hatin pêşkêş kirin û bîryar hate girtin ku bîryarnameya xwenîşanderan ji bo Koşka Sipî û Kongresê bîhê poste kirin. Xwenîşandana han bi xwendina sirûda neteweyî ya **Ey Reqîb** dawî bi akrê xwe ani.

حیزبی دیموکراتی کوردستانی نیران

شەست مال خەمانى بىن وەجان، شەست مال نەپەردى بىن نەھان
لە پىشاو وەجەت سەپسانى مەفە ئەندەۋەنەتىھە تاڭىن كەقىن كورد پېنۇرۇۋ بىت
ناھەنلىكى 60 من سالەگەرى داھىزرا اندىنى حیزبی دیموکراتی کوردستانی نیران

Kurdi-ilta
13.8.2005 Vantaa

ŞIVAN PERWER
KARDO ŞEXO

Aika ja paikka
la 13.8.2005 alkaen klo: 18.00
Korsion kulttuurikeskus Lumo - Vantaa
Urpiaisentie 14 Vantaa

Liput: 15 € aikuiset, 5 € lapset
لەپەرە مال 15 نەزەرە بىن مال 7 - 15 نەزەرە
خواران بىن بىرخەتكۈزۈلۈچ

Cartoon illustration of a man in a boat labeled "IRAN" drowning in the water, with a bird nearby.